

# Welaipareze be lûs kenzi Rûperasyona Mamul

Nûçeya Düzgün Deniz

Ji kuştinên tarî re  
destûrên fermî

Rûpel 3

Zana Farqînî

Zimanê pişkdar an  
yekîtiya zaravayan?

Rûpel 5

Nivîsa Samî Berbang

Etrûş li ber xwe dide

Rûpel 16

NAVEROK




4

Çilkanî Pulîç: Xwediyê vî welatî divê GAP'ê nas bikin



6

Operasyoneke psîkolojîk



13

M. Ronak: Xebateke wekî navê xwe: Nûbûn

Ji Xwendevanan

EZ dizanim kurdiya min ne baş e. Min bibexşin. Hetanî du sal berê min dixwest ez bibim nivîskarekî zimanê tirkî. Di gelek kovarên wêjeyî (edebî) yên tirkî de, (İnsancıl, Varlık û hwd.) nivîsên min hatin weşandin. Berî vê bi du salan min bîryar da ku ez êdî bi zimanê kurdî binivîsim. Ji bo vê yekê, du sal in ku min bi zimanê tirkî rêzek nenivîsandîye. Hê kêmasiyên min gelek in. Lê, ez ji bo rastkirina kêmasiyên xwe hewl didim. Ji bo çi zimanê kurdî? Ji ber ku welatek bênetewe, neteweyek jî bêziman nabe. Ez bawer im kurdî, kurdîtiya me, kurdîtiya me jî Kurdistanê me hîn zelal dide xuyakirin.

KAZIM POLATÊ PÎRAN SWÎSRE

EZ hemû rûpelên rojnameyê dixwînim. Rojname girîng e. Divê rê nîşanî xwendevanan bide. Di rojnameyê de nivîsên quncikan û siyasî bala min dikîşin. Tiştêkî din jî heye, wekî tê zanîn li Kurdistanê kêsatîyeke (şexsiyet) nû tê afirandin, di aliyê xwe de rojname dikare hin gavan biavêje. Ji bo vê jî mirovên wekî M. Can Yüce, Hatip Dicle û hwd, karin di zindanê de ji bo rojnameyê binivîsin. Ku mirovên wiha di rojnameyê de binivîsin wê baştir bibe.

CEMİL ÇEM



Dewlet xizan dike, çapemenî rencîde dike

SAMÎ TAN

Rûyê şer yê qirêjî her roj zêdetir zelal û diyar dibe. Piştî bûyera Susurlukê çapemeniya tirk ji nişka ve dest bi 'kampanyaya paqijiyê' kir. Lê ji bo ku peywendiya kesên ku bi bûyerê re derketine pêşberî raya giştî û şerê qirêjî veşêrin, çi ji wê hat, kir. Medya, bi rojan li ser kuştina patronê qumarxaneyan Ömer Lütfü Topal sekinî, li aliyê din kuştinên kontrayan dom kirin. Niha em pê dihesin, çi dema ku li cihekî kuştina rewşenbîr û welatparêzekî kurd pêk hatiye, Abdullah Çatlı li wir bûye, li wir jî yekî re helbest nivîsandîye. Bo nimûne dema ku Mehmet Sincar hatiye kuştin, Abdullah Çatlı li Êlihê bûye. Dema medya wisa bike, herhal wê endamêkî MÎT'ê jî bibêje: "Min bûyera îpekçî eşkere kir, lê dîmeneke wisa xuya bû ku heke 50 îpekçî jî bîn kuştin, ez xeber nadim."

Van rojan navekî din derkete rastê ku gelek kurd navê wî dizanin. Ev kes Mahmut Demir e, bi bernavê "Yeşil" tê nasîn, gelek kuştinên kontrayî bi destê wî çêbûne. Wî li derdora Dêrsimê bi terora ku li ser gel pêk aniye, deng daye. Li gorî goti-

na Cîgirê Sekreterê Giştî yê CHP'ê Sinan Yerlikaya wî gotiye: "ji bilî Enqereyê ez hesab nadim kesî." Ew jî diyar dike ku rayedarên dewletê-fermana mirovên kurd radikin. Di nav kesên ku bi destê "Yeşil" hatine kuştin de Serokê ÎHD'ya Elezîzê Parêzer Metin Can û Dr. Hasan Kaya jî hene. Dîsa li gorî agahiyên wî ji bo kuştina Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ji dewletê pere stendiye.

Rayedarên dewletê dixwazin bi girtina du sê timên taybet sûcên xwe bincil bikin. Di nava hemû bûyeran de navê Mehmet Açar derbas dibe, lê heta niha der heqê wî de tu tişt nehatiye kirin. Dîsa şirkatiya Tansu Çilerê di gelek bûyeran de heye. Lê meclîsa tirk li pey hev dosyayên der barê sûcên wê de ji rojevê derdixe. Wê bêsûc nîşan dide.

Li aliyê din nemaze li Kurdistanê kirînen ne-mirovî didomin. Ev çend hefte ne gelê Licê li ber xwe dide, di her firsendê de dide zanîn ku naxwaze bibe cerdevan, lê rayedarên dewletê dibêjin ku gel bi daxwaza xwe bûye cerdevan. Rêxistinên demokratîk li pey hev heyetan saz dikin,

dixwazin biçin navçeyê, lê hêzên dewletê rê nadin wan. Gelê navçeyê li rûyê Waliyê Herêmê Necatî Bilican dibêjin ku ew naxwazin: bibin cerdevan, lê encam naguhere. Çapemeniya tirk jî ji bo rewanîşandana helwesta dewletê senaryoyan dinivîse. Li gorî TV û rojnameyên tirk gel ji tirsê PKK'ê dibêje: "Em bi dar-zorê kirine cerdevan."

Dîsa li gorî rapora ÎHD'ê, di sala 1996'an de 78 kes ji aliyê kontrayan ve hatine kuştin, 46 kes jî birîndar bûne. Dîsa 190 kes bi destê hêzên dewletê bêdarezandî hatine kuştin; 194 kes di binçav de hatine windakirin, 68 gund hatine valakirin.

Li aliyekî ev bûyer diqewimin û medyaya tirk ji bo veşartina sûcên dewletê çî jê tê dike, li aliyê din jî heman TV û rojname dîmenên maxdûrên şer derdixin ser ekran û rûpelên xwe, hêstrên nejdil dirîjînin. Lê dîsa jî dev ji şerxwaziyê bernadin, sedemên dîmenan nabêjin, an jî dixin stûyê PKK'ê.

Her wekî çawa ku Endamê Heyeta Rêveber a ÎHD'ya Amedê Vedat Çetin jî dide zanîn sedema van dîmenan şer e, berpîrs jî şerxwaz in. Dewleta tirk gundan vala dike, mirovan li metropolan xizan û reben dihêle, wan mecbûr dihêle ku ji bo parçeyek nan rûmeta xwe bidin bin piyan, medyaya tirk jî bi mebesta rencîdekirinê vê rewşê nîşan dide.

Mirina berê nema tê pejirandin

RECEP AKKAMIŞ

Mirin tiştêkî xwezayî ye. Ji ber ku her zindî li gorî vê zagonê za dibe (tê dinyayê), pişt re mezin dibe û dimire. Ev jî mirineke fizîkî ye. Ev yek qanûna xwezayêye, nayê guhartin. Dema ji bo mirovan jî mirineke wiha hebe, gerek mirineke bi çi rengî be? Em li ser vê pirsê xwe bisekinin.

Dema ku mirov li dîroka gelê kurd dimêzîne, tê dîtin ku êrişên dagirkeran li ser erdnîgeriya (cografya) Kurdistanê tu car kêma nebûne. Van jî, bi xwe re talan û koçberbûna gelê kurd anîne. Ji ber vê sedemê jî, her roj, ji bo gelê kurd bûbû mirin. Ew jî mirineke rezîl û bêrûmet bû. Jiyanê wî di binê potînen dijmin de dihatê perçiqandin. Gelê kurd ji nîrxên xwe yê neteweyî bi dûr diket. Ji bo berjewendiyên dagirkeran, xwîna gelê kurd dihatê rijandin. Êdî gelê kurd, bûbû kuştîyê ber degirkeran. Di dîrokê de dema kurd bi hatina gotin, leşkerên xelkê dihatê fêmkirin. Ji ber ku gelê kurd, ji bo azadî û serxwebûna xwe bi xwîna xwe nerijandiye û ji bo xwe ne bûye leşker. Di dîrokê de tiştê ku gelê kurd bi serfirazî pêk aniye, mirin bûye. Ev jî ne mirineke birûmet û giranbuha bû. Zêdetir mirineke erzan bûye.

Bi sed hezaran xwîna mirovên kurd hatiye rijandin. Lê mixabin di demeke kin de hatiye jibîrkirin û ji bo pêşerojê zêde nîrx dernexistine holê.

Bi derketina tevgera azadiyê re, ev mirina erzan ku li nava gelê kurd hatibû

Her mirovê şoreşger, bi mirina xwe re, divê bêmiriniyê derxe holê. A girîng ew e ku mirov, xwîna xwe nuqit bi niqut birjîne. Dema ku mirov, di nava têkoşînê de ket, ew çax di canê mirov de gerek xwîn nemîne.

afirandin, hate sekinandin. Ew xwîna ku di ber dagirkeran de dihatê rijandin, rê li berê hate girtin. Ji wê demê û bi şûn de her xwîna ku were rijandin, wê ji bo azadî û xelasiya gelê kurd be. Di dewsa vê mirina erzan de, bêmirinî derket holê. Ev mirina erzan di bin piyan de pelçiqandin.

Îro di nava têkoşîna rizgariya neteweyî de, hîna jî cih bi cih gewşinên wê mirina erzan derdikevin. Ji ber ku dema mirov dikeve nav têkoşîna şoreşê, bi xwe re wê jiyanê civakî û şexsiyeta dijmin jî dibe nava şoreşê. Ev şexsiyeta ku zelal nebûye û ji ber ku bandora dijmin li ser kesaniya wî zêde ye, ev rewş jî, dibe bingeha mirineke erzan. Li gorî birdozî û konevaniya partiyê, mirovê ku xwe nû nekiribe, her dem jî wê ji mirina erzan re amade be.

Hinek kes hene ku, dema dikevin nava têkoşîna şoreşê, wekî ku here mirinê tevdiqere. Şoreşê ji xwe re wekî mirinê dibîne û êdî xwe mirî dihesibîne. Mirovên bi vî rengî nêzikî şoreşê bibe, tu car di çalakîyên xwe de afrîner nabe. Lewre şoreş ev e ku, ev mirina erzan a ku dijmin bi gelê daye qebûlîkin, were şikandin û di dewsa wê de jiyanê birûmet û azad were avakirin. Ev jî vatîniya mirovên şoreşger e. Li ser vê rewşê, Serokê

Neteweyî wiha dibêje: "Ne ku şoreş hûnera mirinê ye, daxwaz ev e ku jiyanê ku hatiye windakirin bi hunerî careke din were qezenckirin." Gere mirov bi vî rengî nêzikî şoreşê bibe. Her mirovê şoreşger, bi mirina xwe re, divê bêmiriniyê derxe holê.

A girîng ew e ku mirov, xwîna xwe nuqit bi niqut birjîne. Dema ku mirov, di nava têkoşînê de ket, ew çax di canê mirov de gerek xwîn nemîne. Bi yek careê divê xwîna xwe nerjîne. Dema ku bi yek carekê re xwîn were rijandin, ew çax bi xwe re tu nîrxan dernaxe û dibe sedema mirinekî erzan.

Mirovên şoreşger, her dem ji mirinê re amade ye. Dema ku hate xwestin, ew çax bi çepik û halan diçe mirinê. Ev jî mirineke bi qedr û qîmet e û giranbuha ye. Ev jî, ne mirineke wekî meha payizê ku, çawa pelên daran bi bêdengî diweşe û tu kes pê nabe. Gerek mirinekî wekî Çiyayê Qaf bi heybet û bilind be. Ev yek jî, ancax bi birdozîya partiyê, bi şexsiyeteke nû, bi vîneke tûj û bi bawerîyeke mezin pêk were. Bi vî rengî mirov kare bingeha mirina erzan di şexsiyeta xwe de pûç bike. Lewre di nava gelê kurd de mirina berê nema tê pejirandin, mirina ji bo jiyanê êdî tê pejirandin.



Di dawiya hefteyê de li ser daxwaza Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) û Komara Tirk her du partiyên başûrê Kurdistanê PDK û YNK li hev rûniştin. Nûnerên PDK'ê û yê YNK'ê li ser sînor, Kampa Ertûşê û derxistina gerîlayên PKK'ê ji Başûr, rawestînin.

Heyetan li ser sînor li hev kirin, lê PDK'ê xwe neda ber daxwazên ku li ser PKK'ê tînin kirin. Di rûniştinê de Serokê Heyeta PDK'ê Samî Abdurrahman ji bo biryarê du caran bi telefonê bi Barzanî re axivî. Di Lihevrûniştinê de Robert Paletreu (YDA) û Onur Öymen (KT) jî cih girtin. Ji ber ku DYA ditirse ku partiyên kurd bi Saddam re peywendîyan datînin, dixwaze bi darê zorê wan li hev bîne.



**YEKÛTIYA** Bijîjkên Tirk (TTB), di civîna xwe ya Koneya Navendî de biryara banga seferberiyê girt. Serokê yekîtiyê Fûsun Sayek li ser vê mijarê, roja 14'ê rêbendana 1997'an civîneke çapemeniyê li dar xist û diyar kir ku hikûmet dubendiyê dixwe navbera karmendan. Pişt re jî wê got: "Hikûmet zema ku dide leşker û polîsan, yê din jê mehrûm in."

Endamê Komîteya Navendî ya TTB'ê Muharrem Baytemur jî got: "Heke rojekê şerê kirêt raweste wê bi hêsanî maaşê neh hezar hevalên me derkeve." Sekreterê TTB'ê Eriş Bilalçoğlu jî diyar kir ku hikûmet dixwaze têkî'yên nexweş û bijîkkan bike wekî yê muşterî û firoşkar.

## NÛÇE

### DIK

#### Şarê Licey û dewlet

Nezdiyê jû aşmîyo qiseyê fina Licey sero benê.

Dewleta wazena Licey qoricî kiro, la balê şarê Licey nêwazeno qoricî bo. Qandê coya şarê Licey kombiyayan û partiyanê demokratî ra alîkarî waşt. Ney ser hevey kombiyayîn û partiyên demokratî jû heyet viraşt û şî Lice, ewnay ke dewleta şarî zorna kena qoricî.

Badê na heyet, jû heyeta bînf waşt şîro Lice, la belê dewlet nêvarda, na şîro sûk. Nay sero Partiya Demokrasiya Şarî (HADEP) Serokê de Ahmet Türkî de jû heyet nê ro, waşt şîro Lice, bewno vatenê dewlet, vatenê şarê Licey rast o. Qandê coya Çagenoyê Serokê HADEP Ahmet Türkî û heveyê sermayenê partî, verî şî Amed, Waliyê OHAL'î ziyaret kerd ci ra vat: "Mayê wazemî şîmî Lice rastîna sûk vejimî werte." La balê walî vat: "Dewleta kesî zorna qoricî nêkena, ê ke ewro biye jî, ê xo bi xo biyê. Qandê coya gerek çînyo şîma xo bibetilîne."

Nika ma tiya pers kim, madem Lice de zorna qoricîkerden çînyo, çîma iyê nêvardenê HADEP'î şîro Lice? Niwo jî mûsneno ma ke dewleta nêwazena hunerê ci vejîyo werte. Bado vana: "Ma dewleta demokrasî û hiqûqî me." Dewletan de qe kesî diyo, hîlbijartin de, nîmeyê amorfîndê jû sûk giroto, a partî nêvîrada a sûk. Tevayî wînaynîn jew dewletan de çeteyan de vînyeno. O waxt tevawo wînanîno yêno ma ver, dewleta tirk demokrat niya, dewleta çeteyan a.

MEMED DREWŞ

# Ji kuştinên tarî re destûrên fermî

**Rojnamevan Bayram Balcı dibêje ku şahidê van bûyeran eşkere ne. Ew dide xuyakirin ku Nazım Babaoğlu bi destê Bucakan hatiye revandin. Her wiha Balcı dibêje ku der barê Murat Yoğunluyê ku Nazım xapandibû de jî, ji aliyê devletê ve tu agahî nehat xwestin û tiştêk jî nehatê kirin.**

**K**uştinên "failê melûm" li Kurdistanê ji nû ve zêde bûn. Beriya çend mehan dihatê dîtî ku dewletê ew xebata xwe yê bi vî rengî sist kirîbû. Lê wê rewşê zêde dom nekir. Dîsa cendekên li ber rîyan zêde bûn. Navenda vî karî jî niha herêma ku di navbera bajarên Rûha, Amed û Semsûrê de ye. Ev herêm bi tevahî dikeve nava sînorê Bendava (Baraja) Atatürk. Tê zanîn ku ev dever, bi taybetî ji aliyê hêzên fermî û cerdevanê Eşîra Bucakan tê parastin. Ew qas leşker, timên taybet, polis û cerdevanên Eşîra Bucak li ser van çalakiyan tiştêkî jî nabêjin û berpîrsên van kuştinan bi dest nakevin.

Li herêmê jî her alî ve 4-5 rawestgehên kontrolê hene, dîsa jî kujer (qatîl) bi hêsanî tînin cendekên qurbanên xwe diavêjin, destê xwe li ba dikin û diçin. Rojnameger Bayram Balcı, ku demekê dirêj wekî rojnamevan li Rûhayê xebat kir, dibêje:

"Ji kuştina Şevket Geçgel (11.11.1993), Hüseyin Karalî (06.12.1993), Ahmet Kalpar (08.12.1993), Nazım Babaoğlu (12.03.1994), Faik Kevci (05.01.1995) hêzên dewletê û Eşîra Bucakan berpîrs in." Balcı gotina xwe wiha didomîne: "Şahidê van bûyeran eşkeren e. Ji xeynî wê jî, ez jî bûyera Nazım dizanîm ku ew bi destê Bucakan hate revandin. Der barê Murat Yoğunlu yê ku Nazım xapandibû de jî aliyê devletê ve tu agahî nehat xwestin û tiştêk jî nehatê kirin."

Bi rastî heta bûyera Susurlukê ev tişt dihatin aqilê hin kesan, bes gel jî van tiştan zêde ne bawer bû. Hêdî hêdî ew rastiya çeteyan derketê holê.

Di nava van çar mehên dawî de li vî herêmê 5 kes hatin kuştin, yek jî birîndar bû. Ew der bû wekî herêma sêgoşeya Duzce, Hendek û Adapazarîyê. Çawa kontrayên ku li Stenbolê kar dikin qurbanên xwe dibînin li wir dikujin, yê Kurdistanê jî, ev der jî xwe re kirine navend. Kuştinên bi vî rengî, di 16



berfanbara 1996'an de zîlamekî 35-40 salî li ser km'ya dehan a rîya di navbera navçeyên Rûhayê Bozova û Hîlwanê de hate dîtî. Lê Navê wî hê jî ne kifş e. Ji bêxwedîtîyê beledîyeyê ew helanî bû. Di eynî rojê de cendekêk jî li gundê Kerceswê li Telhê hate dîtî, lê nasnameya wî jî nehatê kifş kirin.

Di 23'yê berfanbarê de îcar li ser rîya Rûhayê û Semsûrê di km'ya 23'yan de li ber pîra gundê Tûrûşê du cendekêk jî aliyê gundiyan ve tînin dîtî û merciyên berpîrs tînin agahdarkirin.

Di otopsiya wan de tînin dîtî ku dest û piyan wan kesan hatine girêdan û devên wan jî bi bandajê hatine girtin. Li ser cendekê wan şopên îşkenceyên giran tînin dîtî. Dîsa di otopsiyê de derdikeve holê ku, ev kes berî pînc rojan hatine kuştin. Dîsa beledîye wan hîltîne. Piştî demekê jî malbata Atilla Korkmaz re agahî tînin û cenaze li Semsûrê jî gorê derdixin û li Amedê jî nû ve defn dikin. Cendekê duyemîn jî bi çendekî bi şûn de li ser naskirina malbata wî derdikeve ku ew Mahmut Önerardî ye.

Atilla Korkmaz li Taxa Amedê Batikentê xwediyê Centrum Marketê ye. Di roja 9'ê berfanbara 1996'an de, seat li 13.30'an çar kesên sîvil tînin ji bo ku "îfadeyên wî bigrin" wî li Renaulteke bi plakaya 21 SV 545 siwar dikin û dibînin. Pişt re cendekê wî tînin dîtî.

Mahmut Önerardî (32) jî şofêrê minîbu-

sekê bû û di navbera Amedê û Licê de dixebitî. Di roja 8'ê berfanbarê de Mahmut dîsa jî bo xebatê li garaja Amedê (a minîbusan) jî hêla polisên sîvil ve tînin girtin û wî bi erebeyêke bi plakaya 21 AV 305 dibînin. Her çiqas bavê Mahmut 13 caran serî li dewletê dide jî, encamêkê bi dest naxe.

Roja 8'ê rêbandana 1997'an, jî gundê navçeya Çermûkê Delwanê sê kes, Yasin Yerlikaya, Yaşar Aktan û Veysi Özkan jî kar derdikevin û diçin Taxa Tepe ya Çermûkê. Her sê heval heta 23.30'ê şevê li qehwê rûdînin, dû re derdikevin ku herin gundê xwe, lê 7 km. li derveyî navçeyê gava li erebê siwar dibînin, jî du alîyan ve tînin gulebarankirin. Yasin û Yaşar tînin kuştin, lê Veysi giran birîndar dibe. Li gorî agahiyan ew her sê zîlam jî cerdevantiyê qebûl nakin û diçin di kana kevîran de karkeriyê dikin.

Li herêmê ev çend sal in ku ew qas însanên sîvil û destvala tînin kuştin kengê berpîrs hatin darizandin? Vedat Aydın, Hüseyin Deniz, Musa Anter, Hafız Akdemir, Ferhat Tepe, Mehmet Sincar, Şevket Epözdemir, Metin Can, Dr. Hasan Kaya û yê din, bi destê "hêzên tarî" nehatin kuştin? Pîrs ev e: Gelo karê dewletê çî ye? Ew bac jî bo çî tînin standin? Heke di bin 'Rewşa Awarte' de ew qas însanên bînin kuştin û parastin wan ne mimkûn be, wê di rewşa normal de çawa bînin parastin? Esas bersiva van pîrsan heye û tînin zanîn jî.

DÜZGÜN DENİZ

# Xwediyên vî welatî divê GAP'ê nas bikin

**Welatên Ereb sekinandina GAP'ê dixwazin. Wekî reaksiyoneke li dijî vî bangê, ji bajarên wekî Îzmîr, Edene û Stenbolê ji odayên bazirganî û pişekarî, komeleyên karsazan û zanîngehan bi balafirên taybetî tînan bajarên Ruhayê. Ewên ku li ser herêma ku GAP lê ye dijîn, heya îro pêwistiya nivîseke bi baldarî jî nedîtine.**

**GAP** Pêşnûmaya Başûrê Rojhilatê Anatoliyayê çi ye? Ji aliyê tatbîqê ve GAP li ku ye? Armanca GAP'ê çi ye? Heya îro li gorî nîsbeta rastbûna GAP'ê çi çêbûne? Rayedarên Komara Tirkîyeyê bi çi çavî li pêşnûmayê dinihêrin? Yên ku di qada tatbîqiyê GAP'ê de dijîn, der barê wê de çi dizanin û bi çi çavî lê dinihêrin? Aliyê navneteweyî ya GAP'ê heye an nîn e?

Ez dizanim bi rastî bi kitekit ez nikarim bersiva van pirsan hemûyan bidim. Lê belê ez dixwazim ji xwendevanên Azadiya Welat ra der barê GAP'ê de bi kurtahî hin agahiyên pêşkêş bikim. Heke ez bikaribim der barê GAP'ê de bibim semedê lêgerînê, lêkolînê ramanî û gengêşî li ser vî mijarê dest pê bikin da ku ev pêşnûma rojekê bikeve xizmeta welatê me ezê jî xwe gelek bextiyar û dilşad bihesibînim.

GAP di vî demê de li gerdûnê yek ji pêşnûmayên sereke tê hesibandin û li Komara Tirkîyeyê pêşnûmaya (projeya) herî mezin e.

Ev pêşnûma beşên berjêr ên robarên Ferat û Dicle ligel deştên ku di navbera van robaran de dimîne di hundirîne. GAP 74.000 km çargoşeyê ji beşên jorîn ên Mezopotamyayê digire nava xwe. Ew qas aqar, 1.7 caran bi qasî erdê Holandayê û 2.4 caran jî bi qasî erdê Belçikayê ye.

Bajarên Amed, Dîlok (Entab), Elihê, Kilîs, Merdîn Ruha, Semsûr, Sêrt û Şirnexê an bi temamî an jî beşek ji wan di nav qada GAP'ê da dimînin. Di warê pişekariyê (senayî) de bajarê Amed û di warê bazirganiyê de (ticarî) jî bajarê Dîlokê wekî navend tîne pêşkêşkirin.

Çavkaniya avên sererd robar (çem) yanê Ferat û Dicle ne. Avên Ferat û Dicle ji sînorên jûr ên Iraq darbas dibin. Hemû potansiyela van robaran 53 mîlyon metrekûp/sal in. Ev qas av beramberî % 30 hemû potansiyela avên Tirkîyeyê (186 mîlyar metrekûp/sal) ye. Gava em potansiyela erdê GAP'ê bidin ber potansiyela Tirkîyeyê:

Aqar (yüzölçüm)	1/10
Gelhe (nifus)	1/10
Robar	3/10
Avên binerd	1/4
Hidro elektrîk enerjî	1/4
Avdan	1/5

GAP li ser robarên Ferat û Dicleyê

plan bûne. Armanca pêşnûmayê avdan, enerjî û ji bo peydakirina ava vexwarinê û bikaranînê ya bajarên mezin e. Jiyan a borî (ekonomîk), siyasî û civakî bandora hev û du dikin. Tê îdiakirin ku wê sektorên mîna çandinî, vejen (enerjî), ragihandin, pişekari û tûrîzm digel hev baş bibin û ew wê bibe sedema pêşveçûna herêmê.

Gava ku Pêşnûmaya GAP'ê temam bibe, wê di salekê de 27 mîlyar kwh enerjî hilberîne û 1.7 mîlyon hektar erd were avdan; ji bo bajarên mezin wekî Amed, Dîlok û Ruha 256 mîlyon metrekûp ava vexwarinê û bikaranînê peyda bibe ji bo damezirîna sezgehan heyî piştî sala 1995'an bahayê digel sala 1995'an 53 trîlyon TL xerc kirine heya wê demê li GAP'ê 216 trîlyon xerc dikin.

GAP li tejanê berjêr Feratê heft heb û li tejanê Dicleyê şeş heb, ango tevî hev ji sêzdeh baq pêşnûmayên mezin pêk hatiye.

Dema em van nêrxan didin ber çav, dibînin ku qada GAP'ê bi taybetî bi çavkaniya av û erd e û bi vî awayî jî çiqas dewlemend e. Li herêmê daneyê avhewa (îqlîm) bi kêrhatî ne û li hêla din bi vejenê tavê jî dewlemend e. Di sala de 2.3 ber tîrî tê standin. Ancax tengasiyên di warê belavbûna baranê, di warê teknîkên çandiniyê yên nûjen rê li ber pêşveçûnê digirin.

Pêşnûmayên ku armanca wan enerjî ne, li temam bûne, yên ku mane di demê kin de diqedînin.

Ewên ku armanca wan avdan in di qonaxê pêşin rawestîne, ji wan zêhf kêma amade bûne, ketine çalakiyê.

Rayedarên Komara Tirkîyeyê tim û tim diyar dikin ku hewcedariya wan bi giranî bi enerjî heye. Ji ber vî yekê pêşnûmayên avdanê naxwazin saz bikin. Mînak pêşnûmayên avdanê pampaj û binerd, Siwereg, Berêçik, Peravê Rastê Pîran (Dicle Sağ Sahil), Peravê Çepê Pîran, Elihî, Mêrdîn, Serekaniyê, Semsûr wisa dihelîn; çênakin.

Wezîrê ji GAP'ê Berpirs Fehm Adak di sala 1996'an de li Ruhayê di panelêkê de diyar kir ku bi ewqas digel diravdanî (tehsîs) GAP hetanî 170 salî bi zor te-



mam dibe.

Serkomar Süleyman Demirel ji sala 1993'yan de diyar kiribû enerjîya ku bendavên li ser robarên Feratê mîna Keban, Zînara Reş û Bavê Reş (Atatürk Barajı) tîne mezixondina (mesrefa) GAP'ê amortî dikin. Li aliyê din pîsporek komara tirk her tim dibêjin: "Ji bo GAP'ê em ew qas mesref dikin. GAP ji Tirkîyeyê re barekî giran e." Çima wiha (wer) durûtiyê dikin? Çima ewqas vir û derewan dikin?

Em li tetbîqkirina pêşnûmayên avdanê dinihêrin. Tê de gelek kêmasî hene. Mînak: Avdana Dešta Haranê bi prolem e. Avên ku ji qada avdanê vegere, li ku û çawa birijînin. Dewleta Surî avên ku vala dibin naxwazin, napejirîne. Lê Îsraîl pê re elaqedar dibe.

Li aliyekî din ji aqara avdana pêşnûmaya berjêr a Ferat 9 sed hezar hektar e. Lê belê hetanî sala 1995'an tenê 30 hezar hektarî ji avdanê re vedikin. Ev jî bi rîya sistema bypassê vedibe. Rayedarên dewlet tirk di warê xapandina raya giştî ya gerdûnê, ya Tirkîyeyê de bi ser ketin. Ji bo vekirina avdana 30 hezar hektar erd tenê û vekirina tûnelên Ruhayê ev du car in ku merasîmê çêdikin.

Çima berî pêşin pêşnûmaya tûnelên Ruhayê û avdana Dešta Haranê dest pê dibû? Ji ber ku Bendava Bavê Reş, tûnelê Yaslıca ji tûnelên Ruhayê re hîn nêziktir in. Çima berî pêşin avdana Sirûç, Bazîkî dest pê nekir? Gelo ji qada GAP'ê gelê Dešta Haran tenê ereb in, ên din hemû jî kurd in?

Di sala 1980'yî de serokê cuntayê Kenan Evren pênaber ji Afganîstanê anîn. Ji bo wan malan çêdikin, zevîyan li wan belav dikin, ji wan re birên sondajê û sazgehên avdaniyê ava dikin. Çima gelê me yê ku li herêmê rûdin, bêzevî û belengez in? çima erd nadin wan? Erdê kê didin kê?

Ji berê ve hetanî îro şerên Rojhilata Navîn bi piranî ji bo bikaranîna avê derketibûne. Hin mirovên zanyar wisa îdia dikin. Di rojên pêş de li vî herêmê av wê mîna neftê (petrol) binirx bibe. Îro li Rojhilata Navîn bêyî Tirkîye, Lubnan û Iraqê hemû welatên din tengasiya avê dikişînin. Çavkaniyên avên sererd ên sereke li herêmê robarên Ferat, Dicle û Nîl in.

Li gerdûnê serê kesekî 1200 metrekûp/sal bes tê pejirandin. Rojhilata Navîn sih sal berê avê terê dikir, lê bi zêdebûna gelê, zêde av hate xerckirin, ji ber kêmbûna avên binerdî ev rêje li Filistinê 60 metrekûp/ sal, li Urdûnê 110 metrekûp/ sal, li Îsraîlê 150/metrekûp/ sal li Surî ku 400 metrekûp/ sal e.

Pirsgirêka avê ji îro ve di navbera welatên ereb û komara tirk de her roj tê rasttê. Ferat û Dicle çemên der-sînorî ne. Zagonên heyî yên li ser mafên bikaranîna avên navneteweyî ku ji nav welatekî derkevin, tîrî çareserîya pirsgirêkên di nav dewletan de nakin.

Welatên Ereb bang dikin dibêjin: "GAP'ê bidin sekinandin." Wekî reaksiyoneke li dijî vî bangê, ji bajarên wekî Îzmîr, Edene û Stenbolê ji odayên bazirganî û pişekarî, komeleyên karsazan û zanîngehan bi balafirên taybetî tînan bajarên Ruhayê; serok dewletên Îsraîl û Îranê jî tînan.

Ewên ku li ser herêma ku GAP lê ye dijîn, berhevkirina agahiyên zanyarî, lêgerîn û lêkolînan deynin aliyekî, îro pêwistiya nivîseke bi baldarî jî nedîtine. Madem xwediyê erdan bi rastî em in, pêwist e der barê van çavkaniyan de em bibin xwediyê agahiyên zanistî. Ji bona teşeyê herî berdar parastina çavkanî bikûwam. Karsaziye cure cure bi detay zanyarî bibûwam û bikaribim rêya van tegerim û bibînim.

ÇILKANÎ PULIÇ

# Zimanê pişkdar an yekîtiya zaravayan?

Mijara li ser "yekîtiya zaravayên kurdî" ji rojeva me dernakeve. Wisa xuya ye ku em dê hê pir li serê bisekinin û guftûgoyan bikin.

Di mêtûya 09. 01. 1997'an de, di bernameya Peyv û Raman a MED - TV'yê de, ev dabaş careke din hate gengeşkirin. Her kes (çi kesên ku bi rîya telefonê û çi jî yên ku li studyoyê amade bûn) bi zaravayê xwe axivîn. Em di serî de bibêjin ku, ev tiştêkî cihê-reng bû û hem jî tiştêkî gelekî baş bû. Ji ber vê yekê em pêşkêşê bernameyê Mazhar Günbat pîrozbahî dikin.

Em jî bi rîya telefonê tevî vê bernameyê bûn û me ramanên xwe derbirin, yanê me fikrên xwe îfade kirin. Lê bi telefonê mirov nikare tam a dilê xwe bibêje. Em dibêjin qey hem jî aliyê hindikbûna wext ve û hem jî nebûna li studyoyê tîra xwe vê rewşê rave dike.

Ji ber van sedeman, me xwest ku em îcar bi nivîskî van ramanên xwe, yê der barê mijarê de, derbibin. Ji aliyê din ve, wêfêkî nivîsê heye ku ew mayînde ye, lê gotin ne wisan e. Ew careke tenê tê bihistin û nema tê dîtîn. Bi gotineke din, çaxê yek bixwaze van raman bi awayekî nivîskî peyda bike, nikare bi-bîne, bixwîne û ji wan sûtê wergire.

Piştî vê pêşekê em bîr ser mijara xwe ya hîmî. Di destpêkê de îtiraza me jî gotina "yekîtiya zaravayên kurdî" re heye. Di cihê wê de gotina zimanê pişkdar (zimanê muştêrek) ji me re bêhtir maqûl tê.

Çima? Eger em bala xwe bidine pra-

tîka neteweyên pêşketî wekî alman, fransîz, îngilîz û îtalyanan em de bibînin ku, wan ev qonaxa em tê de ne, li dû xwe hiştine û gelşa xwe ya zimên safî kirine. Hem jî bi zimanê pişkdar, ne bi yekîtiya zaravayan.

Ji dîrokê em nimûneyan bidin: Zimanê pişkdar ê Yewnana Kevn li ser zaravayê Attîkê, yê latîni li ser zaravayê Eyaleta Latiumê ku Roma jî dikeve, yê îtalî li ser yê Floransayê, yê spanî pêşî li ser yê Toledoyê û paşê jî li ser yê Madridê, fransîzî li ser yê Parisê, îngi-

riteyê de çêdibe.

Em jî taybetiyekê jî çêl (behs) bikin ku, bi yek-kirina zaravayan ev yek pêk neanîne. Lê, ji zaravayên din jî hatiye îstifadekirin.

Di dîrokê de em rastî hewlên ji bo afirandina zimanekî pişkdar ê cihanê jî tên, ku jê re zimanê çekirî, zimanê sîmî tê gotin. Ji wan zimanê çekirî yê ku herî bi nav û deng e ESPERANTO ye. Afirînerê wî jî Dr. Zamenhof e. Tê xuyakirin ku demekê ji sed hezarî zêdetir mirov bi zimanê Esperanto peyivîne.

rê vekîtê (rastnivîsê) de û çi jî di warê bikaranîna şeweyeke (teşe, şekl) hev-girtî ya peyvvan de...

Em tiştêkî girîng jî ji bîr nekin: Ji bo ku berbihevhatinek di nav zaravayan de jî çêbe, pêwîst e ku meyl li ser bikaranîna literatûreke pişkdar be. Nemaze peyvên ku nû tênê çekirin divê ku hemû zarava mîna hev bi kar binin, ligel hin cudahiyan. Ev cudahî jî bêhtir di warê bilêvkirinê de dikare xwe bide der.

Ji bo peyvên nû em çend nimûneyan bidin: Komar, kovar, pirtûk, pênuş, zarava, rojname, hunermend, karmend, wênêkêş, parêzer, dadger, dozger, nivîskar, helbest, wêje, dîrok, zanyar, zannîst, civak...

Peyvên nû, ku me li jorê çend mînak ji wan dan, ji bo berbihevhatina zaravayan keys û delîveke qenc didin me. Ne tenê kesên ronakbîr û xwende wê ji hev tê bigihin, bere bere kesên ramakî, kesên me yên ji rêzê jî wê bi hêsanî ji hev fêm bikin.

Eger em mijara xwe bidine hev, em dikarin vê bibêjin: Metoda qenc ew e ku zimanê pişkdar li ser zaravayekî rabe û ew zarava jî ji hêla zaravayên din ve bê xurtkirin.

Her wiha ew zarava bibe zimanê pişkdar, di warê nivîskî, warê wêjeyî, hêvotin (perwerde), hîndekarî, danûstendîne resmî de. Bi kurtî di hemû kar û barên otorîteya pişkdar de.

ZANA FARQÎNÎ

**Eger em bala xwe bidine pratîka neteweyên pêşketî wekî alman, fransîz, îngilîz û îtalyanan em de bibînin ku, wan ev qonaxa em tê de ne, li dû xwe hiştine û gelşa xwe ya zimên safî kirine. Hem jî bi zimanê pişkdar, ne bi yekîtiya zaravayan.**

lîzî li ser yê Londonê (Londrayê), yê almanî jî li ser zaravayê Saksonyaya Jorîn çêbûye.

Di pêkanîna zimanê pişkdar ê alman de para Martîn Luther pir û pir e. Çimkî wî cara pêşîn hîmê vê yekê danî û încîl bi vî zaravayî wergerande zimanê xwe.

Taybetiya vê rewşê jî ev e: Zimanê pişkdar, ji cih û deverên navendên çandî, bazirganî û siyasî rabûne. Zarava û devokên van herêman serî ji yê din standine û bêhtir di nav gel de belav bûne, bûne zimanê wêjeyê, zimanê nivîsê.

Ev yek bi vî û hemdê xwe, jixweber naqewime. Di encama biryara oto-

Divê em jî bo xwe karibin ji van pratîkên hanê kelk û sûtê wergirin. Ne ku em van tecrûbeyan di ser guhê xwe re biavêjin.

Der barê zaravayên zimanê me de jî raman û nêrînên me ev in:

Her zarava gerek dike ku bi hemdê xwe bi pêş ve here, biperise û tu asteng dernekeve pêşiya wan. Divê rewşên bîr û nivîskar û hunermend xwedî li zaravayên xwe derkevin, pê binivîsin, bi-axivîn û pê bistrên.

Ligel vê, divê ku her zarava di nav xwe de standartekê bîne pê. Çi di warê niqandina devokê de (ji bo telafûzê pêwîst e), çi di warê gramerê de, çi di wa-

## Têkoşîna li hemberî bêdadiyê (2)

CELALETTİN YÖYLER



Me di nivîsa xwe ya beriya vê de gotibû ku, "Xweda di ayeta 75'an de, li ser mijara koçberiya misilmanên Mekkeyê, fermana têkoşîna li hemberî bêdadiyê daye" hem jî bi her rewşên têkoşînan, di vê ayeta pîroza ku me anî rojevê û hemûçkên ayetên Qurana Xweda de, bi balkêşî ji bo hemû kesan, ne ji bo yek yekan diyar dikin.

Di vê ayetê de Xweda gazî hemû kesên ku bawer kirine dike ku di hemû dem û xwarî de, bi gazîkirineke bilind û eşkere ji bo "xwe gorîkirina" bi canê xwe û hemû heyînen xwe yê giranbuha, hem jî bi hemû hêza xwe ji bo têkoşîn û parastina di ber olê û belengazan û bindestan de, ji bo parastin û rizgarkirina wan ji bîr nîr û qeydên koletiyê; koletiya bi her awayî. Hem jî rizgarkirina kesan û gelan ji şapatên dagirkeran û mêtîngeran. Her wiha jî parastina gelan û

neteweyan, ji tevdanî û gemariyên mêtîngerên bi navê ola îslamî ya paqij û zelal jî tê xwestin.

A bi van hûmêrînen li ser van bûyeran, "Cihada bênebê" (ferz) ji bo olê bi tenê nîn e, hem jî ji bo cenga li hemberî kafiran bi tenê nîn e. Ango kufra ku êrîşker be li ser îslamiyetê, lê belkî li hemberî hemû zordest û xişimkaran e; li hemberî hemûçkên tev-daniyan û xapandinan e, li hemberî hemû dagirkeran û mêtîngeran e, bi hemû awayê têkoşînan, yek caran bi mal, yek caran bi pênuşê (qelemê), yek caran jî bi can û bi çek! Ewên sitemkar û dagirker û mêtînger jî, kî di bin bila bibin, çi bira, çi pismam, çi lêzim, çi nêzik, çi misilman, çi kafir, bi hemûyan re têkoşîna bi her awayî pêwîst e û bênebê ye ku bê kirinê.

Li ser vê ramanê, di "hedîsa sehîh" de, ji Enes hatiye sehkirin. Ew jî wiha dibêje: "Pêximber (S.A.W) gotiye: "Alîkariya birayê xwe bike, çi stemkar çi stemlêbûyî, "Enes dibêje: "Me got hey resûlê Xweda ewên ku stem lê hatiye kirin em alîkariya wî bikin, lê çawa emê alîkariyê bikin. "Ev e alîkariya te ji wî re." Buxarî.

Li vir em der barê têkoşîna li ser bêdadiyê diaxivin, li ser vê têkoşînê pêxemberê îslamê wiha dibêje: "Ji bo mirovekî ku tê cem pêx-

ember jê re dibêje: "Hey pêxemberê Xweda, heke yek bi stemkarî malê min ji min bistîne?" Pêxember, jê re dibêje: "Malê xwe nedê." Mêrik dibêje: "Lê heke li min xist ku malê min bi zor ji min bistîne?" Pêxember dibêje: "Tu jî lêbixê." Mêrik dibêje: "Lê ku ew min bikuje?" Pêxember dibêje: "Tu wê gavê şehîd î." Mirov dibêje: "Lê ku ew bê kuştin?" Pêxember dibêje: "Ew dikeve agir." (E, tac; Muslim ji Ebû Hurey re îrawayet dike.)

Dîsa jî di hedîsêkê din de, Ehmedê Kurê Henbel, wiha dibêje: "Pêxember gotiye: "Ewê ku misilmanek li cem wî û berçavê wî were perçiqandin û tehdakirin û ew jî alîkariya wî misilmanî neke, hem jî di kare ku alîkariya wî bike, Xweda roja qiyametê wî dide rezîlkirinê, hem jî li ber çavan."

Têkoşîna li hemberî stemkaran pêwîst e. Wisa jî alîkariya bêkesan û belengazan, bêyî cudatiya olî û nijadî ango ew kes ku zordestî lê dibe, çi kafir, çi misilman be, pêwîst e ku piştevaniya wî bête kirin, ji ber ku fermana Xweda ne ji bo misilmanan bi tenê ye; ji bo her kesê ku navê wî mirov e, bêcudatiya di navbera kesan û gelan û nijadan û olan de.

Nîşe: Ev nivîs ji pirtûka min a bi navê "Gelperwerî û Nijadperestî" ye, ku di nêzik de wê bê çapkirin.

# Operasyoneke psîkolojîk

**Dewleta tirk her ku di şer de tîk diçe, giraniya xwe dide ser şerê psîkolojîk. Ev şer jî bi alîkariya çapemeniya qaşo paqij û li ser agahiyên ji rastiyê dîr tê meşandin. Mînakeke vê yekê operasyona sersalê bû, li gorî agahiyên çapemeniya tirk, bi dehan gerîla hatibûn kuştin di vê operasyonê de.**

**Bes daxuyaniya Fermandarê Eyaleta Botan ê ARGK'ê Murat Karayılan, bûyerê bi awayekî din rave dike.**

**D**i destpêka 1997'an de hate diyarkirin ku hêzên dewletê operasyoneke berfireh li lemberî PKK'ê li başûrê Kurdistanê pêk anîne û di operasyonê de 154 gerîla hatine kuştin, bi dehan gerîla jî birîndar bûne. Cihên stratêjîk ku di destê PKK'ê de bûne jî gişk hatine bombabankirin û gerîlayên ARGK'ê ji hev belav bûne, gişk ber bi başûr reviyane. Çapemeniya tirk jî dida xuyakirin ku hêzên dewletê derbeyeke pir mezin li PKK'ê xistiye. Heta derdorên siyasî jî diyar dikirin ku êdî dawiya PKK'ê hatîye û bi van derbeyên mezin qedandina PKK'ê zûtir dibe.

Çapemeniya tirk tu caran cih nade gotinên aliyê din, hin caran çewtiyên berdevkên artêşê jî rast dike. Li ser vê qaşo operasyona navborî, Fermandarê Eyaleta Botanê Murat Karayılan di 4'ê rêbendanê de daxuyaniyek da. Tevî ku wekî vê daxuyaniyê wekî nûçe girîngiya xwe hinekî wînda kiriye jî, ji bo eşkerebûna hin rastiyên belgeyê heja ye.

Li gorî daxuyaniya Karayılan, bûyer bi awayekî din e. Murat Karayılan da xuyakirin ku bi her awayî hêzên dewletê, li herêmê tengav bûne û nikarin ji herêma şer vekişin. Li gorî vê daxuyaniyê gerîlayên ARGK'ê di destpêka salê de êriş birine ser Tabûra Kerîya Reş û tabûr dorpêç kirine, bi çekên giran xesareke mezin dane tabûrê û pir leşker jî di êrişê gerîlayên ARGK'ê de

hatine kuştin, piştî vê êrişê hêzên dewletê hatine heremê. Tê gotin ku tabûr heft rojan di bin dorpêça gerîla de maye, ji panzde avahiyên tabûrê bi tenê yek li pê maye, yên din gişk ji aliyê êrişên gerîla ve hatine hilweşandin. Li ser vê yekê hêzên dewletê roja pêşîn ber bi Çiyayê Cûdî xwestine operasyonek pêk bînin lê bi ser neketine. Hêzên dewletê îcar li ser xeta ercanê xwestine êrişekê pêk bînin lê bi êrişê gerîla ew jî tîk çûye. Dîsa şeş helikopterên dewletê xwestine leşker daxînin, lê gerîla ew hêz jî doprêç kirine û helikopter careke din ew leşker ji paş ve hildane û nikaribûye tîmekî hilde. Ew tîm jî bi dijwarî û bi tarîtiya şevê re ji destê wan xelas bûye. Bi tenê hêzên dewletê yên hewayî li herêmê çiya bombe kirine, wekî din tu êrişên dewletê li başûrê Kurdistanê çênebûne. Li aliyê din Karayılan li ser îdiaya ku gerîla belav bûne û nikaribûne bi artêşê re şer bikin û 154 heb jê hatine kuştin jî di daxuyaniyê de diyar dike ku ev taktîkeke gerîla ye, gerîla her tîm li cihekî nasekinin, bi komikên biçûk ve êrişan pêk tînin.

Fermandarê ARGK'ê yê Eyaleta Botan Murat Karayılan, li ser çalaki û livbaziyan PKK'ê yên ku wê di nava sala 1997'an de pêk werin jî disekine. Karayılan dide xuyakirin ku ji bo sala 1997'an jî vê gavê amadehiyên baş pêk tînin û bi her awayî xwe ji şerê germ re amade dikin. Ev çalakiyên wan wê di sala 1997'an de bibin bersiva kesên ku



dibêjin 'Va ye em PKK'ê diqedîn', Karayılan dide xuyakirin ku ew hem ji bo şer hazir in û hem jî ji bo aştîyê.

## Leşkerên tirk ji şer aciz bûne.

Di destpêka salê de Fermandarê Giştî yê Artêşê a Tirk Î. Hakkı Karadayı wiha digot: "Heta ku hem aliyê civakî ve û hem jî ji aliyê leşkerî ve û alîkariya dewletên din ji PKK'ê neyê qutkirin, PKK nayê qedandin. Ev şer wê demeke dirêj hê bidome." Tiştêkî balkêş di vê axaftina Karadayı de hebû, wî wekî yên din 3 meh, 6 meh temen ji PKK'ê re nedibiri. Cigira Serokwezîr û Wezîra Karê Derve Tansu Çiller jî îtiraf dikir û digot: "Rêxistîneke ku li tevî dinyayê rêxistinîya xwe pêk aniye re şerkirin ew qas hêsan e?!" Mebûsê Refahê yê Culemêrgê Naim Geylani jî li ser kuştina 154 gerîlayên ARGK'ê wiha digot: "Operasyoneke wiha çênebûye, heta hêzên ARGK'ê êrişî ser tabûra Kerîya Reş kirine û kuştina 154 gerîlayan jî derew e." Rojnemevan Celal Balşlangîç jî di nûçeyê xwe ya li ser Licê de wiha nivîsandibû: "Rayedarên leşkeriyê ji me re gotin ku, 'Me îstîxbarat hildaye ku PKK wê di navbera 8-10'ê rêbendanê de êrişî ser tabûran bike, ji ber vê yekê em nikarin ewletîya we bikin, bi vê mebestê ve em nahêlin hûn herine Licê.' Bi vê gotinê jixwe ew rayedar îtiraf dikir ku

PKK'ê êrişî ser tabûrên wan kiriye. Dîsa nivîskarê rojnameya Radikalê İsmet Berkan jî di nivîseke xwe de li ser operasyonê wiha nivîsibû: "Di serê salê de me li malên xwe ereqa xwe vedixwar, lê PKK'ê dixwest serê salê jî di xwîne de bihêle. Hêzên me dersa ku layîqbûn dan wan." Ev gişk didine xuyakirin ku haya giştikan ji êrişê gerîla hebû, lê wekî ku gerîla êriş nekiriye, hêzên dewletê êrişî ser gerîla kiriye dipeyîvîn. Li aliyê din hin leşker jî tewra xwe ye li hemberî şer roj bi roj bi awayekî fermî nebe jî nişan didin. Li Cizîrê serleşkerêkî, ku nexwastiye navê wî bibêjin, ji hin rojnemevanan re wiha got: "Em naxwazin şer bikin êdî, li aliyekî em tene kuştin li aliyê din birayên me, lê yên li jorê wekî ku qet tiştê nabe li ser xwîna me politikayên kirêt dimeşînin." Ev jî bêhêvî bûn û xwestina qedîna şer dide xuyakirin. Ev gişk derewên wan derdixistine holê, li aliyê din cendekê leşkeran jî dîsa dihatin, îcar jî digotin 'leşkerê me pê li mayîne kiriye.'

Her wiha li Kurdistanê dewlet dide xuyakirin ku sûcên herf mezin, wekî çekfirotin, eroîn, esrar ji aliyê cerdevanan ve tê kirin. Lê li Licê, li Farqînê bi darê zorên hin kesan dike cerdevan û li Batmanê jî dest danîna ser çekên 40 cerdevanî. Tê ditin ku kesên êdî gumana xwe ji dewletê birine naxwazin şer bikin bi awayekî tene tasfiyekirin, di cihê wan de jî hinekên nû bi zorê tînine ser kar. Ev tê meneyeke din jî, di eynî wextê de tê xwestin her kurd bibe dijminê PKK'ê, an jî PKK bibe dijminê hin kurdan.

METİN AKSOY





● 24.1.661

Hiz. Ali li bajarê Kufayê hat şehîdkirin.

● 21.1.1924

Vîladîmîr Îlîç Lenîn çû ser dilovaniya xwe.

● 25.1.1936

Mustafa Paşa Yamlukî çû ser heqîya xwe.

● 22.1.1946

Komara Kurdistanê ya Muhabadê, di bin serokatiya Qazî Mihemed de hate damezirandin. Li gorî dîrokzanan, ev yekemîn dewleta hemdem a kurdan e; kesin jî hene ku dibêjin kurdan bi tenê di dîroka xwe de

dewleteke temenkurt damezirandine ku ew jî Komara Kurdistanê ya Mehabadê ye. Serkomara Qazî Mihemed jî wekî gelek serokê kurdan birin ber sêdarê û ew şehîd kirin.

● 19.1.1992

Karbidestê Partiya Keda Gel (HEP) ê Nisêbînê, Abdurrahman Soğut jî aliyê hêzên kontrayî ve hate kuştin.

● 25.1.1993

Serokê Partiya Azadî û Demokrasiyê (ÖZDEP) yê bajarê Erzinganê Cemal Akar, jî aliyê hêzên tarî ve hate revandin û bi dû re cendekê wî hate dîtin.

AWIR

# Kongreya yekemîn a YRK'ê çêbû

MAZHAR GÜNBAT/ BRUKSEL

Roja 11'ê rêbendanê li Kolnê Yakîtiya Rojnamevanên Kurdistanê (YRK) kongreya xwe ya yekemîn li dar xist û tê de kargerîyê nû hilbijart. Kongreya ku beriya nivro saet li 11'an piştî rêzgirtina ji bo şehîdan dest pê kir û tê de nêzikî 80 rojnamevanên kurd amade bûn, heman roj saet li şeşê êvarê qediya. Yekemîn axivgerê kongreyê Serokê YRK'ê Günay Aslan pêşî rapora salane ya xebatên YRK'ê xwend, dû re xebat û sala çûyî nixand û rexne hem li xwe û hem jî li kargerîya berê girtin.

Hê di destpêka rûniştinê de Günay Aslan da diyarkirin ku ewê xwe ji serokatiyê vekişîne û nema dixwaze di nav kargerîyê de cih bigire. Aslan wekî sebeb jî nebûna wext û zêdebûna kar û barên xwe yê din nîşan da.

Piştî xwendina mesajên pîrozkirinê, ku di nav wan de yê Serokekê PKK'ê Adullah Öcalan û Serokekê Rojnamevanên Norwêçê jî hebûn, beşdarên civînê dest bi axaftinên xwe yê rexneyî û nixandî kirin. Ji bo bersivandina rexneyan, Aslan careke din hat serkursiyê û anî zimên ku rexneyên li kargerîya berê hatine kirin li cih in lê bi bîr anî ku heta ku awayê meşandina sazîyên kurd ên sîvîl neyê guhertin, bi guherîna kargerîyan jî serkeftin mimkûn xuya nake.

Di rûniştina dawî de ji bo kargerîya nû hilbijartineke nehênî hate pêkanîn û nehê jê esîl, sêzdeh kesên nû ji bo kargerîyê hatin hilbijartin. Li pey hilbijartinê, dor hate pêşkêşkirina daxwaz û pêşniyazên beşdarên. Di kongreya 1'ê ya YRK'ê de li şûna kargerîya berê, ya nû bi hilbijartina van rojnamevanên kurd hate pêkanîn: Tunçay Doğan, Rıza Doğan, Yusuf Cacım, Ali Özşerik, Ethem Söylemez, Ahmet Karakaya, Ali Can.

Kargerî wê di nav xwe de serokê/a nû hilbijêre.

Ji bo nixandineke berbiçav a kongreya yekemîn a YRK'ê, wê baş be ku pêşî bi çend gotinan behsa kongreya sala çûyî ya damezrandinê bê kirin. Sala çûyî bi mebesta lihevkomên serê sibeya 17'ê reşemiyê beriya civînê bêhtir ji sed rojnamevanên kurd û çend hebên biyan li eynî cihî amade bûbûn û bi çêşeke germ û kêfxweşî li hev civan, hêvî, daxwaz û pêşniyazên xwe dianîn ziman.

Dema rûniştina kongreya ku du roj domiya, dest pê kir eynî çîş û germahiyê dişa xwe diyar dikir û di tewr û axaftina beşdarên de biryardariyê mezîna dihate dîtin.

Di kongreya îsal de, hem beriya kombûnê, hem jî di dema kombûnê de bi qasî ya par ew çîş û germahî nedihate dîtin. Guftûgoyên ve kombûna dawî bi qasî yê kongreya damezrandinê ne xurt û ne zengîn bûn. Vê carê hejmara kesên ku tevî guftûgoyan bûn jî, ne zêde bûn. Tevî ku kombûnê rojek tenê berdewam kir, hewayeke tengzariyê jî li ser hin beşdarên xwe dide xuyakirin.

Serokê YRK'ê yê berê Günay Aslan bi axaftina xwe ya dawî wêneyekî bedbîn xêz kir. Li gorî Aslan sazîyên kurd ên sîvîl diyabû awayê meşa xwe biguherandana û ji niha û bi şûn ve ji bo serkeftinê pêwîst bû bi pîvanên hemdem ê sazîyên neteweyî kar û barên xwe bimeşandana.

Ji endamên kargerîya berê İrfan Doğan li nêrinên Aslan rexne girt û anî ziman ku beravajî wan gotinan rojnamegerîya kurdî xwedî derfetên mezîna e û dikare gavên serkeftinê di demeke kin de biavêje. Niha hemû çavên ku li hêviya serkeftinê rojnamegerîya kurdan in, li ser xebatên kargerîya nû ya Yakîtiya Rojnamevanên Kurdistanê ne. Di kongreyê de atmosfer û axaftinên xwe didan ber çavan bi kurtî ev bûn.

## ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



### Ev 79 sal in ku licî li ber xwe didin

Di rojên dawiyê de Komara Tirk dişa li Licê provakasyonan li dar dixê. Dewlet dixwaze bi darê zorê xort û mîrên Licê bi çek bike û li Licê sîstema ceştiyê pêk bîne. Lê, licî li hemberî ew qas zordestî û barbarîya dewletê dişa jî çekên dewletê nagirin û li ber xwe didin. Çend roj berê ez li Brukselê bûm. Hevalekî ji min pirsî:

- Mamoste ma tu jî ji Licê yî an na?

- Belê, ez ji Licê me!

- Tu dibêji dewlet çima ew qas bi awayekî barbar bi ser Licê ve diçe?

Min dest pê kir û behsa dîroka Licê ya 79 salan kir:

Licê kela berxwedanê ye. Bexçeyê nîştimanperweriyê ye. Berxwedana liciyan wiha ne ya çend roj û çend salan e. Berxwedaneke dîr û dirêj a dîrokî ye. Ev berxwedan îsal 79 saliya xwe tijî dike. Berxwedan û serhildana liciyan hîn berî damezrandina komara Tirkiyê ya nijadperest dest pê dike û heta îro dom dike.

Di salên 1918'an de, li Licê Şaxê Cemiyeta Kurdistanê (Kürdistan cemiyeti şubesi) tê damezrandin. Çapxana kurd a yekemîn li Amedê dest bi karê çapê dike û bi navê Gazî kovara Cemiyeta Kurdistanê tê weşandin. Di redaksiyona kovarê de Pertewê Licî cihê xwe digire. Di sala 1925'an de Serhildana Şêx Seîd her çiqas li Pîranê dest pê dike, lê pêşî dewlet li Licê teslimî hêzên Şêx Seîd dibe û Lice rizgar dibe. Fehmî Firat (Fehmiyê Licî) sekreterê Şêx Seîd e. Di têkçûna şerê Şêx Seîd de cihê ku herî zêde zerarê jî dibîne dişa Lice ye. Li gorî nîfûsa wê demê jî 6 hezarî bêhtir licî tîr şehîdkirin. Piraniya gundên Licê tîr şewitandin.

Di şikêstina Şerê Agiriyê de jî careke din artêşa tirk diavêje ser Licê. Licî jî vî şerê Agiriyê re dibêjin "Şerê Şêx Seîd ê duduyan." Careke din bi dehan kes tîr girtin û kuştin. Di salên 60'î de PDK li Licê xurt bû, tîkîlî bi tevgera Barzanî re hebûn. Di warê aborî, eskerî û lojîstîk de ji Barzanî re alîkarî dikirin. Piştî 1965'an Partiya Karkerên Tirkiyeyê (TİP) jî 15 hezarî bêhtir deng ji Licê girt û Tarîk Ziya Ekinci yê Licî bû parlamenter. Paşverû û faşîstên tirk navê "Moskovaya biçûk" li Licê kirin.

Ji liciyan gelek kesên xwenda û zana hene. Piraniya liciyan li derî Licê ne. Hema hema li hemû bajarên Kurdistanê hene. Piraniya Liciyan dewlemend in. Bi kurdî dipeyivin. Kesên ne politîk jî li dijî dewletê ne. Bi rik in, ji dewletê hez nakin. Çaxaxî li herêma zêde ye, her cureyên çek li Licê hene.

Di sala 1975'an de li Licê erd hejiya û di wê erdhejê de nêzikî 5 hezar kesî mirin. Dewletê bi zanabûn alîkariya liciyan nekir. Ji bo protestokirina dewletê em di meha zivistannê de ji Licê heta Amedê meşîyan. Hema hema ji hemû gundên Licê gundî beşdarî meşê bûbûn. Du şev û du rojan meşê dom kir. Ez qet ji bîr nakim, em dimeşîyan. Me nêzikî li nehiya Mermerê kiribû. Ez û çend gundiyan Pêşkêvir bi hev re di eynî rêzê de dimeşîyan. Min dest pê kir û ji wan re behsa sosyalîzm, kurdayetî û tîkoşînê kir. Demeke dîr û dirêj guhdariya min kirin. Piştî re ji wan kesekî wiha bersiva min da:

- Xoce, me û Romê hestî ji hev û du şikandiye û em tu carî li hev û din nayên. Ez bawer im roja ku şerê giran bikeve erdê, hûn dê me di nav şerê de bihêlin û birevin. Dişa em dê careke din di nav lingan de herin. Ka bila ew roj bê, dê tu bibînî xalê te ji kozîkê radibe an na. Tew xwezî bi wê rojê!

Piştî 1975'an tevgerên şoreşger li Licê gelek xurt bûn. Di nav wan de pêşbirîkekê dest pê kir. Di sala 1978'an de li gundê Fîsê PKK hat damezrandin. PKK'ê dema di sala 1984'an de dest bi şerê çekdarî kir, ciwanên Liciyan jî wê yekê re amade bûn. Ji wê rojê heta îro bi sedan licî beşdarî nav şoreşê bûn. Bi hemû hewldan û xebata dewletê jî derî gundê Sinê ku ew jî ne kurd in, tu gundî çekê dewletê negirt û ceştî nekir.

Ji aliyê cografîyê ve Lice cihêkî xwe yê stratejîk heye. Ji aliyê rojhilat ve bi zencîra çiya Lice, Paşûr (Qulp) û Sasonê bi eyaleta Amed û Botan ve girê dide. Ji aliyê Bakur ve digihê Dara Hênê, Amed û Serhedê bi hev girê dide. Ji aliyê Rojava ve dişa bi zencîra çiyayê Hênê Pîran, Maden, Çermûk, Çingûşê Eyaleta Tolhildan û Dersimê bi hev û din ve girê dide.

Belê, "dijimînê bavan, nabin dostê lawan!" Ev du nîş in ku licî serî jî dagirkeran re xwar nakin û di bin her şert û şîrûtên dijwar û giran de, tîkoşîna xwe ya ji bo azadî û serxwebûnê didomînin. Licî bi qerar û bi hêvî ne. Îro ji do xurtir in, ji ber ku bi rêxistin in.



Remzî Nafî Reşîd

Sedem çî dibin bila bibin, li ber çavan rastiyeke heye: Em dîroka gelê xwe ya nêz jî qenc nizanin. Rojnameger û nivîskar FAYSAL DAĞLI pêşî di pirtûka xwe ya bi navê "Ateştên Portreler" (Portreyên ji Agir) de bi taybetî em bakurî ji bûyereke dîrokî agahdar kirin. Niha jî bi beşa pêşîn a ve rêzenivîsa hanê careke din me ji Remzî Nafî Reşîd, Operasyona Mamût û ajanê alman Gottfried Johannes Müller haydar dike.

**D**îroka kurdan jî wekî jiyana wan e. Bi êş û bi îbret e. Lê kurdan ji van êşan îbret stendine an na? Bersiva vê pirsê ne pozîtîf e û ne kifîş e. Li bajarê Hewlêrê, min çîroka Remzî ya bi êş û maxrûr çend caran guhdarî kir. Wekî serpêhatiyên qehremanekî romanên bûn, ku ji tixûbê rastiyeke derbas dikirin.

Ew derketiye ser bircên cesaretê û di milê şeytan de, di bin kûrahiyên cehennemê de li rêçên bilindahiyên îlahî geriyaye.

Ji bo ku mirov serpêhatiya Remzî ji hemû aliyan ve fêm bike, pêwîst e ku şertên siyasî yên wê demê û şertên ku Remzî xuliqandine bînin nixandînin. Di vê serpêhatiyê de, Serokê Kurdên Başûr Şêx Mahmûdê Berzencî û Rêxistina Hîwa roleke girîng dileyîze. Û tebiên di serpêhatiya wî de -ku xof dide mirov- şîrîkê wî zabîte Alman Gotfrîd Müller û di jin jî...

Ji bo ku bigihîje armanca xwe, metodên ku hîlbijartine çî dibin bila bibin û ev metod ji aliyê me ve bi çî awayî bîn

nixandînin jî, ev bihaya Remzî jî bo dîroka Kurdistanê kêr nabe.

Em dizanin ku yek ji bêmîrîdiya kurdan ew e ku, ew jî dîroka xwe re bêleqae ne. Dema mirov vê bêmîrîdiyê bîne ber çavan, gotin û fêmkirina çîroka Remzî bi girîngiya xwe tê ber me.

Bi vê baweriyê...

### Dilşewatê welat Remzî

Remzî Nafî Reşîd sala 1917'an li Hewlêrê ji dayik bûye. Bavê wî axayekî zengîn e û di salên 1918'an de tevî Şêx Mehmûdê Berzencî, li dijî îngilîzan şer kiriye. Di sala 1930'î de, li Hewlêrê di dibistanê de ji mamosteyên welatparêz ders digire û fikrên neteweyî fêr dibe û edebiyata kurdî bala wî dikişîne.

Di sala 1939'an de dibe endamê Rêxistina Hîwa. Hîwa ji aliyê welatparêzên kurd ve hatiye damezrandin. Wê salê jî bo perwerdeya zimanê îngilîzî diçe Koleja Robert a Bêrûdê. Bi xelata Freshman dibistanê diqedîne.

Li Bêrûdê welatparêzên kurd ku ji

# Welatparêzê û Operasy

welatên xwe dîr ketine, nas dike. Di nav wan kesan de, ji bakurê Kurdistanê Kamûîran Bedîrxan, Nureddîn Zaza, Ekrem Cemîlpaşa û ji Başûr jî Muhamed Ermexanî hene.

Remzî, piştî ku wan jî nas dike, jiyana xwe gorî welatê xwe dike. Bi heycan e. Li hemberî kesên ku li dijî fikrên wî derdikevin, gelek tund e. Li Bêrûdê bi Serokê Partiya Komünist a Sûriyeyê, Xalid Bektaş re pir guftûgoyan dike. Bektaş, kurdekî Şamê bû. Wî digot pirs-a mezin a neteweya ereb e. Pêwîst e pêşî ew bê çareserkerin. Carek, di van xeberdanan de Remzî li Bektaş dide. Wî bi xulamtiya biyanan tawanbar dike. Li gorî wî Bektaş jî mîletê xwe re xizmet nake.

Bektaş di sala 1954'an de bû mebus û di sala 1957'an de jî, ji ber baasîyan re viya çû Sovyetê.

### Stenbol, warê rewşenbîrên kurdan

Piştî xelaskirina kolejê li Bêrûdê, li Zanîngeha Amerîkan di sala 1941'ê de dest bi xwendina "Fakulteya Aboriyê" dike. Lê ew vedigere Hewlêrê. Piştî salekê, ji bo dewamkirina xwendina xwe diçe Stenbolê. Li wir rewşenbîrên kurd nas dike û dikeve nav tevgera Kurdistanî.

Wê demê li Stenbolê, rewşenbîrên wekî Remzî Bucak, Ziya Şerfhanoglu, Musa Anter, Yusuf Azizoğlu, Faik Bucak, Kasim Kufrevî, Hayrî Saracoğlu, Necatî Cemiloğlu û jî kurdên rojhilatê Kurdistanê (Îranê) jî Huseyn Ahmed û birayên wan ê biçûk Abdurahman Qasimlo hene. Dîsa ji başûrê welêt (Iraqê), ji malbatên sirgûnbûyî ên wekî Mala Bedîrxaniyan, Cemîlpaşa, Şêx Seîd, Seyîd Taha gelek kurdên welatparêz hene.

Stenbol bûye wekî Kurdistanêke biçûk. Lê kurd li vir di bin kontroleke pir tund de ne.

### Cemiyeta Rizgarî ya Kurdan

Ji van rewşenbîran hinekan di nav xwe de rêxistineke nehênî ava kirine. Navê wê Cemiyeta Rizgarî ya Kurdan e. Ala ku çêdikin jî li ser şerîdên kesk, sor û spî taveke zer datînin.

Xwendevanên kurd ên li Stenbolê jî bo xortên kurd lê bimînin, wargehekê (yurdekê) bi navê "Dicle" avâ dikin. Musa Anter di bîranînen xwe de behsa vê wargehê dike. Apê Mûsa dibêje:

"Wê demê me carinan bi navê "Şevên Dicleyê" civîn li dar dixistin. Konsolê alman ê navdar Von Pagen bi tevî qîza xwe dihat şevên me. Digot: 'Ez

apê we me.' Alman xwe û kurdan jî nijadekê dihesibandin."

Her wiha Apê Mûsa dîsa dibêje ku, di wargeha wan de, xwendevan bûbûn du beş. Aliyekî alman û aliyekî jî îngilîz û rûs diparastin.

Remzî qerar dide ku here Anatoliyayê. Li wir hem parçeyê Kurdistanê yê herî mezin û hem jî agirîkî bi dizî heye. Li gorî wî eger çalakiya kurdistanî ji bakur ve bê lidarxistin, wê bigihîje mirazê xwe. Bi vî mirazî tê Stenbolê. Bi rewşenbîrên vê derê re dikeve têkiliyê. Û dest bi fakulteya aboriyê dike.

### Îstixbarata tirk bi Remzî diheso

Li dijî CHP'ê û dîktatoriya Mîlî Şef (İsmet İnönü) Remzî di nav tevgera kurd de dest bi xebatê dike. Lê îstixbarata tirk ji xebatên Remzî haydar dibe. Ji bo ku vî bi dest bixe dikeve hereketê. Ji bo Remzî êdî rojên qaçaxiyê dest pê kirine. Hevalekî wî, ku ev mirov sîxurê almanane, lê şîret dike ku ew xwe biavêje Qonsolosxaneyê Almaniyayê. Hevalê wî, kare wî li wir veşêre û di demeke kin de wê wî derxin derveyî Tirkiyeyê. Dem, bihara 1943'yan e.

### Müller

#### li Rojhilata Navîn e

Gottfried Johannes Müller, di sala 1935'an de, diçe Rojhilata Navîn. Müller her çiqas dibêje ku ew ji bo macera û gerê bi tevî bisikletekê çûye jî, di şertên wan rojan de, ev hinek ji aqil dîr e. Îhtîmal e ku ew bi mebesta karê îstixbaratê



Müller li Hewlêrê bi malbata Remzî Nafî Reşîd



# bêtirs Remzî

## ona Mamût

çûbe. Di ser Balkanan û Tirkiyeyê re diçe Qudsê, jî wir berê xwe dide Bexdayê. Her cihê ku diçe, bi mirovên balkêş ên li dijî Îngilîzan re hevdiştinan pêk tîne.

‘Însanên ku Müller li Bexdayê wan dibîne yek jê jî Şêx Mahmûdê (Hefizdanê) Berzencî ye. Serokê wê demê, berxwedanvanê bi nav û deng Berzencî, yê salên 1920’î, piştî serhildana 1930’î ku dîsa jê re serokatî kiribû, bi ser neketibû û ji aliyê dagirkerên Îngilîzan ve sirgûnî Bexdayê bûbû.

Müller, bi Berzencî re li ser kurdan xeber dide. Şêxê pîr, jê re dirêj dirêj behsa dîroka Kurdistanê û tevgera rizgariya neteweyî dike. Müller, dema ku diçe Iraqê, 22 salî ye. Ew li ser hevdiştina xwe û Şêx Mahmûd Berzencî wiha dibêje: ‘Ji min re, ‘Müller efendî kurd ji biyanan hez nakin. Lewre biyanên ku hatine Kurdistanê, ji bo kuştina kurdan, talankirina Kurdistanê hatine. Lê min tu ji xwe re nêz dîtî’ got û nargîleya xwe dirêjî min kir. Xwest ku ez jê re bibêjim bavo. Û eger ku daxwaziyeke min hebe jê re bibêjim. Min jî ‘Ez dixwazim welatê bavê xwe bibînim’ got û min dewam kir:

‘Rewşa wisa nabe, bêdewlet, bêbajar nabe, ev wisa nameşe. Kurd çima mecbûr in her dem li çiyayan bisekinin. Mirov pêwist e alîkariya we bike.’

### Aşiqbûna kurd û Kurdistanê

Şêx li ser vê yekê, kurê xwe Şêx Le-tîf û çend xizmetkarên xwe da ba me û em bi hesapan çûn Kurdistanê. Ji bo ku em pirsra Kurdistanê nas bikin û di wî



(1992)

warî de hinek tiştan bikin. Di vê seferê de ez bûm aşiqê kurdan û Kurdistanê. Dêrdên xwe digotin, dilsoz bûn, min li wir tenêbûn nas kir. Pêwiste e dewleteke mirov, mezinekî mirov hebûya, lê yê kurdan tune bû. Û ez wê demê fikirîm, mirov çawa kare alîkariya kurdan bike?’

Piştî ku Müller ji Kurdistanê vedigere dibe leşker. Sal derbas dibin û rutbeya Müller di artêşê de bilind dibe û wezîfeyên cur bi cur digire ser xwe. Şerê Cîhanê yê Duyemîn jî dest pê kiriye. Di sala 1942’yan de ku şer ji her aliyê ve didome, Müller bi wezîfeya zabîte îstîxbaratê tê Stenbolê. Li çend dibistanên taybet der barê matodên îstîxbaratê de perwerde dîtiye û ajaneke baş e.

Li vir, li dijî faalîyetên Îngilîz û Sovyetê dixebite. Di şebekeyeke îstîxbarata Alman de hem şef e û hem jî operatorê bêtêlê ye. Agahiyên ku li wir bi dest di-xe, dişîne Berlînê û çar caran diçe Almaniyayê û tê.

### Müller û Remzî li Stenbolê ne

Müller jî, dema ku Remzî Nafî Reşîd li Stenbolê xwendevanê zanîgehê ye, li Stenbolê ye. Sal 1942 ye. Karê wî yek jî ew e ku bi kurdan re pêwendiyê deyne. Ligel vê yekê Müller dibêje ku wî li Stenbolê bi kurdan re tu têkilî nîkarîbûye deyne. Lê îstîxbarata almanan her wekî tê zanîn li Tirkiyeyê gelekî çalak bû û bi rihetî dixebitî.

Em bawer dikin ku Müller naxwaze têkiliyên wê demê eşkere bike. Lewre bi hezaran rewşenbîr, cihû û yên din ji ber zilma nazîyan reviyabûn û li Stenbolê penahende bûn. Li aliyê din bi dehan rewşenbîrên kurd li Stenbolê bûn.

Danûstandinê Almanya û Tirkiyeyê gelek baş in. Enqere hevalbendê Hitler e. Hitler di roja 22’yê pûşpera (hezîrana) 1941’ê de emrê êrişê Sovyetê da; 3 milyon û niv leşker herikîn ser axa Sovyetê. Berî wê êrişê, Almaniyayê beşeke mezin a petrola xwe ji Stalîn distîne. Piştî şerê nav wan, ev çavkanî ziwa bû. Di destê almanan de tenê petrola Romanya û komira başûrê Almanya mabû.

Dem û şer çiqas pêş dikeve, artêşa alman li hemberî Artêşa Sor nikare li ber xwe bide û bi paş ve dikişê.

Ji bo Almaniyayê mexlûbiyetê dest pê kiriye. Müller li ser sebebên paşketinê çar caran bi hevalê xwe yê zabîte, Hans Kristof re xeber dide. Li gorî tesbîta wan, sebeb ew e ku petrola wan tune ye û şansê bereyekî din tune ku li hemberî Artêşa Sor vekin.

(Petrolê di vî şerî de roleke gelek girîng leyst. Almanan petrola xwe ji komirê çêdikirin û ji Romanya temîn dikir.



Gottfried Johannes Müller

Müller gelek car li ser petrolê û cepheyekî nû difikire. Şêx Mehmudê Berzencî û başûrê Kurdistanê tîna bîra wî. Tebîen bîrên petrolê yên Musûl û Kerkûkê ku ew di bin dagira Îngilîzan de ne. Lê pêwist e li hemberî Îngilîzan û petrolê tiştêkî gelekî giranbiha ji kurdan re bê pêşniyazkirin; rizgarî û azadî! Lê dîsa pêwist e ku ji kurdan re giranbihabûna petrola wan neyê gotin.

Lê wê têr nedikir. Lewina berê xwe dan Kafkas, Azerbaycan û Bakûyê.)

### Petrola kurdan balê dikişîne

Müller gelek caran li ser petrolê û cepheyekî nû difikire. Şêx Mehmudê Berzencî û başûrê Kurdistanê tîna bîra wî. Tebîen bîrên petrolê yên Musûl û Kerkûkê ku ew di bin dagira Îngilîzan de ne. Lê pêwist e li hemberî Îngilîzan û petrolê tiştêkî gelekî giranbiha ji kurdan re bê pêşniyazkirin; rizgarî û azadî! Dîsa pêwist e ku ji kurdan re hêjabûna petrola wan neyê gotin.

Müller, bi vê fikra ku heyecan dide wî, ji Serokartêş Feldmareşal Wilhelm Keitel re raporekê dinivisîne. Di rapora xwe de dibêje ku ew serekên eşîrên Kurdistanê nas dike, eger destûr bê dayîn, ew dikare here Kurdistanê û li wir li dijî Îngilîzan serhildanekê bide destpêkirin. Bi vî awayî ew karin petrola wê derê ji bo artêşê bi kar bînin. Dibêje ku, kurd neyarên Îngilîzan in, ew dixwazin dewleteke serbixwe ava bikin û wê piştgiriya wan serekên ku ew wan nas dike, bikin.

Li gorî Müller serhildana ku li başûrê Kurdistanê dest pê bike, wê biavêje rojhilatê Kurdistanê jî. Piştî hinek destekan, artêşa alman a ku li Kafkasiyayê sekiniye, kare êrişêkê nû bide destpêkirin.

Piştî şandina raporê, ecele wî dixwazin Berlînê. Müller, ji bo îzahkirina plana xwe dertê hizûra Keitel. Müller di vê hevdiştinê de dibîne ku Serkaniya Leşkerî Ya Alman der heqê petrola Kurdistanê de gelek nezan e.

Di pey girtina petrolên Bakûyê de, mirazê artêşa alman ew bû ku, li Iraqê di bin Kumandariya General Romel de artêşa alman a li Misir û Kafkasiyayê bigihîne hev; bi vê, dixwastin Îngilîzan ji Rohhilata Navîn biavêjin.

### Hitler rapora Müller diecibîne

Bi serhildana kurdên Başûr, wê li cihêkî ku musaîd e, balafirgehek bê çêkirin. Bi serhildanê wisa Müller difikire ku ew karin Kurdistanê çend hefte di bin kontrolê de bihêlin û pişt re jî wê leşkerên alman bi paraşûtan xwe bigihîjin wan.

Dûmahîk Rûpel 15

# Rewşa wêjeya kurdî

**Nivîskarêkî kurd dema bixwaze berhemeke klasîk ji nû ve binivîse, pêwîst e bingeh û hîmê wê zêde nehejîne û kirasên qirêjî lê neke. Gava ku lê bike jî, divê destê xwe deyne ser wîjdanê xwe.**

**D**i van salên dawî de, toreya (wêjeya) kurdî ya nivîskî li ser bingeha toreya devkî û ya klasîk şax daye. Ev şaxdan, bingeha xwe ji jîndariya kevneşopî ya kurdî digire û ber bi avakirina toreya kurdî ve diçe.

Di dema çûyî de dengbêj û çîrokbêjên me, berhemên toreyî eivandin ser hev û di navbera dema çûyî û diwarojê de pirek çêkirin. Bi saya wan, Ehmedê Xanî Mem û Zîn nivîsî û kurd kirin hevparê toreya cihanê.

Ehmedê Xanî hem hîmdarê toreya kurdî ye û hem jî hevalbendê Homeros, Vergîlîlus, Civîzes, Dante, Cervantes, Ferdewîsî, Shakespeare, Goethe, Balzac, Tolstoj û Dicken e. Bêşik nivîskarên kurd ên klasîk hîmê toreya kurdî danîne. Em bi Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Nalî, Salîm û hostayên din ên navdar serbilind in.

Her wisan kovarên kurdî yê mîna Rewşen, Şano û Sînema û Nûdem berhemên van salên dawî ne ku di toreya kurdî ya hemdemî de cihekî girîng girtine. Bi rastî gavên girîng hatîne avêtin, berhemên heja û giranbîha jî derketine meydana. Em dikarin bi serbilindî qala toreya kurdî bikin û bibêjin kurd xwedî wêje ne.

## Nasnameya nivîskarekî

Şerefxan pirtûka xwe ya bi navê Şerefname bi farişî nivîsiye. Her çendî naveroka pirtûkê li ser dîroka Kurdistanê be jî, em nikarin wî wekî nivîskarekî kurd bihesibînin. Ev tişt ji bo Yaşar Kemal û Ahmet Arif jî derbas dibe. Yanê kî dibe bila bibe, bi çi zimanî nivîsiye nivîskarê wî zimanî ye. Heger em di sa vegerin ser vê pirsê; toreyan û nivîskarên navdar ên mîna Yaşar Kemal û Ahmet Arif, em wekî nivîskarên zimanê tirkî dihesibînin.

Nasnameya neteweyî bi pirsê zimên ve girêdayî ye. Bila kes xwe nexapîne. Dema nivîskar bi zimanekî biyanî dinivîse, ji karê neteweya xwe dûr dikeve û sûde dide toreyeke din. Bi gotineke din, kesên ku kurd in, lê bi zimanê biyanî dinivîsin, ji tevgera kurd û azadkirina Kurdistanê jî dûr dikevin. Dema em qala toreya kurdî dikin, bêguman em tenê berhemên ku bi zimanê kurdî hatine nivîsandin, fêm dikin. Nivîskarekî kurd ku bi zimanekî din nivîsiye, ew berhem nabe berhema gelê kurd. Di vî warî de mîsalên din jî hene. Şairên tirk ên herî navdar ku serê tirkî bilind dikin Nabî, Fizûlî û Neffî ne, kurd in. Lê her çiqas ew kurd bin jî, ew nivîskarên tirk in.

Di pîvanên literatûra navneteweyî de mirov nikare qala literatûra kurdî ya nûjen bike. Ev pirs bi pêşveçûna civat û geşbûna zimên ve jî girêdayî ye. Heger em bixwazin toreya kurdî bibe hevparê toreya cihanê, divê em li dijî dijminê xwe şer bikin û saxên xwe berdin nav xaka welêt.

Piraniya pirtûk û kovarên kurdî li derveyî welêt têne weşandin; ji lewre jî, ji tehm û çêja civakî ya kurdî dûr in. Naveroka wan qels e, ziman qels e. Bi bawerîya min, mirov nikare toreya kurdî bide ber toreyên din yê cihanê. Toreya kurdî di nav şert û mercên taybet de dijî.

Dema em berhemên Mehmed Uzun, Erebe Şemo, Ş. B. Soreklî û hwd. dixwînin, dibînin ku herikbar in. Ev tişt ji bo nivîsên Zana Farqînî û Firat Cewerî û Hesenê Metê jî derbas dibe. Herikandina nivîsaran bi ge-



Erebe Şemo

lemperî, bi zimên û pênuşşoriyê (qelemşoriyê) ve girêdahî ye.

## Romana Kurdî

Li gorî çavkaniyên zanistî, Maksîm Gorkî daye ser şopa realîzmê û Erebe Şemo jî wekî realîstê civakî tê naskirin. Di nav romanên Erebe Şemo de, romana herî baş Dimdim e. Romana kurdî ya gerîla, dikare ji gelek motifan sûde wergire. Bi gotineke din, romana kurdî dê li ser toreya devkî, klasîk û li ser jiyana civakî ya rojane ava bibe.

Gava ku em toreya cihanê dixwînin, em dibînin ku nivîskar li ser çend rêbazên edebî berhem dane, wekî: Klasîzm, sembolîzm, realîzm, modernîzm, postmodernîzm. Lê ev rêbazên hanê ji bo kurdan derbas nabin.

Nivîskarekî kurd, dema bixwaze berhemeke klasîk ji nû ve binivîse, pêwîst e bingeh û hîmê wê zêde nehejîne û kirasên qirêjî lê neke. Gava ku lê bike jî, divê destê xwe deyne ser wîjdanê xwe. Romana kurdî ya klasîk, divê bi motifên çandî, neteweyî, mîtolojîk, rêzani û aborî ve bê honandin û xemilandin. Yanê, nivîskarên kurd dikarin klasîkên kurdî yê mîna Memê Alan ji nû ve vejin.

Her du berhemên Homeros yê bi navê "îliade" û "Odiseen" bûne bingehên romanên Ewropayê. Heger

Erebe Şemo wekî realîstê civakî tê naskirin. Di nav romanên Erebe Şemo de, romana herî baş Dimdim e. Romana kurdî ya gerîla, dikare ji gelek motifan sûde wergire.


em vegerin ser avakirina romanên Ewropayê, romanên wan li ser bûyerên civakî, dîrokî, çandî û mîtolojîk ên welatên wan ava bûne. Bi vî awayî, wan romana xwê ya neteweyî bi pêş xist û pirtûkên baş ên navneteweyî ava kirin û hejahiyan nû li toreya cihanê zêde kirin.

Dema ku nivîskarên Ewropayê yê mîna Cervantes û Danîel D. û hwd. romanên xwe nivîsin, Ewropa di nav guherîneke rêzani de bû. Şer û berxwedana rêzani dest pê kiribû, civat ber bi jiyana nû ve diçû; dewra feodalîzmê xera dibû û dewreke nû dest pê kiribû. Sa zûmana mirekiyên Ewropayê jî hev diketin û her neteweyek ber bi dewleta xwe ya neteweyî ve diçû. Îro Kurdistanê jî rewşa wisani e. Yanê welatê kurdan di nav guherîneke rêzani û toreyî de dijî.

Dema mirov bixwaze qala romana modern bike hingê navê Joyce tê ser zimanê mirovî. Di vî wateyî de, romana kurdî ya nûjen (modern) tune ye. Joyce, di romana xwe de teknîka monologên hundirî girîngtir di bîne. Ew dadikeve hûrbûn û kûrbûna dabeşan.

Heger em vegerin ser berhemên M. Uzunî, naveroka wan bi motifên toreya devkî û klasîk hatine neqîşandin û honandin. "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" romana manekê klasîk e û li ser bingeha toreya devkî û ya klasîk ava bûye.

MARUF YILMAZ



Li navendên çandê çalakiyên ve hefteyê  
 Li Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) ya Stenbolê  
 ● 19.01.97 **Yekşem:** Konsera Boğaziçi Kardeş Türküler, saet: 17.30  
 BEKSAV Nehirler Şiir Topluluğu, saet:17.30  
 ● 22.01.97 **Çarşem:** Gotûbêja Ahmet Aras li ser Evdalê Zeynikê,  
 saet:18.30  
 ● 24.01.97 **În:** Film: Rêveberiya Awarte (Sikiyönetim), saet:18.30  
 ● 25.01.97 **Şemf:** Panel: Di Tekoşîna Kurdan de cihê Daweya 49'an  
 Naci Kutlay,Tarik Ziya Ekinci, Canip Yıldırım, Nazmi Balkaç, saet:14.30  
 NÇM-Yekîtiya Malbatan: Ji xwarinên kurdan çend mînak, saet:15.30  
 Konsera Koma Amed, saet:18.00

Li Evrensel Kültür Merkezi  
 ● 19.1.97 **Yekşem:** Belgewariya Metin Göktepe-Izzet Keser  
 Gotûbêj: Azadiya Çapemeniyê, Azadiya Gel a Xwegihandina Nûçeyên û  
 Mîzah, Kovara Leman, saet: 16.00  
 Li BEKSAV'ê  
 ● 25.1.97 **Şemf:** Panela nîrxandina Sala 96'an:  
 Atilay Ayçin (Serokê Hava-Işê)  
 Eren Keskin (Çigirê Serokê giştî yê Komela Mafên Mirovan)  
 Selim Okçuoğlu (Endamê Meclîsa Partiya HADEP'ê)  
 İsmail Sarıoğlu (Rêveberê BEKSAV'ê)  
 Rêveberê gotûbêjê: Parêzer Metin Kazan, saet: 14.00

RÛDAN

Medyûm an jî medya

"Gava Hüseyin Deniz hate kuştin, nûçegihanê Cumhuriyetê bû. Wê kuştina wî, bes wekî kurtenûçeyekê da zanîn. Dema ku İzzet Kezer hate kuştin, Sabahê roja yekemîn da zanîn ku ew ji aliyê tîmên taybet ve hatiye kuştin, lê roja din kir stûyê PKK'ê."



Roja 11'ê rêbendanê li BEKSAV'ê panelek hate li dar xistin. Ragıp Duran, Yıldırım Özcan û parêzer Osman Ergin wekî axivbêj beşdarî panelê bûn. Axivbêjan li ser durûtiya çapemeniya dewletparêz, medyaya alternatîf, metabûna nûçeyan û zagonên çapemeniyê dîtinên xwe anîn zimên.

Rêveberê panelê Sedat Şenoğlu di axaftina xwe ya destpêkê de daxuyand ku, digel ew qas qirêjiyan medya wekî tişteki paqij tê pîrozkirin û tê gotin ku 'Sipas ji Xwedê re ku medya heye.'

Rojnamevan Ragıp Duran, di axaftinên xwe de bi taybetî li ser metabûna nûçeyan rawestiya. Duran da zanîn ku li Tirkîyeyê azadiya ragihandina nûçeyan tune ye. Paşê jî wî got ku, li welatên rojavayî komîsyonên çapemeniyê li dijî neheqiyên dewletê rojnamevanan diparêzin. Duran wiha peyivî: "Azadiya ragihandinê, tê wateya gel dikare bêqeyd û bend nûçeyan bi dest bixe."

Ragıp Duran, li ser metabûna nûçeyan sekini û da zanîn ku, nûçe êdî tînin kirin û firotin. Duran wiha axivî: "Îro li ber azadiya ragihandin û bîdestxistina nûçeyan astengiya herî mezin sermaye ye. Bi tenê dewlemend dikarin xwe bigihînin nûçeyan. Îro emê bi 4.5 milyar li Fadimeyê temase dikin. Nûçe wekî şovan û mîna klîban tînin honandin." Duran diyar kir ku, êdî nûçe bi diravan tînin amadekirin û bêdirav nayên weşandin. Ew avahiyên berz û bilind bi çek û krediyên bêbergîdan (karşılıksız) hatin avakirin. Her wiha Duran got: "Îro li ser medyayê tîrsa reklamdarên heye. Medyayê nikare li dijî reklamdarên dewlemend nûçeyan amade bike."

Ji axivbêjan rojnamevan Yıldırım Özcan jî, zagona çapemeniyê wekî zagona trajî-komik nîrxand. Özcan li ser rewşa medyayê jî wiha got: "Kesên ku di mehekê de 150-200 milyon pere

distînin nikarin eş û pîrsgirêkên gel fêm bikin."

Parêzerê Özgür Gündem û Demokrasiyê Osman Ergin bi taybetî li ser durûtiya çapemeniya tirk û rewşa çapemeniya kurd rawestiya. Ergin wiha dom kir: "Îro komîsyona çapemeniyê Işık Yurtçu ziyaret dîke. Lê, tu kes xwedî li Hüseyin Deniz, Ferhat Tepe, Hasan Özgül, Fatih Yeşilbaş dernakeve. Işık Yurtçu jî ji ber nûçeyên li ser tevkujîya Şirnexê hate girtin. Yê din jî rojnamevanên profesyonel bûn."


Gava Hüseyin Deniz hate kuştin, nûçegihanê Cumhuriyetê bû wê rojnameyê kuştina wî bi kurtenûçeyekê da zanîn. Her wiha Ünal Erkan ji Hafız Akdemir re jî bo beşdarbûna civîna çapemeniyê dawetiyê şandiye. Dema ku İzzet Kezer hate kuştin, Sabahê roja yekemîn da zanîn ku ew ji aliyê tîmên taybet ve hatiye kuştin, lê roja din diyar kir ku PKK'ê ew kuştîye."

Di dawîya panelê de beşdarên li ser pîvanên medyayê, durûtiya medyaya dewletperest û medyaya alternatîf pîrsarasteyî axavbêjan kirin. Li ser pîrsan Duran da zanîn ku peywira (wazîfe) çapemeniyê wekî "hêza çaremîn" ev e ku agahî û rûdanan ku desthilatdar ji raya giştî vedîşêrin pêşkêşî raya giştî bike. Duran li ser rojnamegerên lêgerîner jî ev tişt got: "Uğur Dündar diavêje ser atolyeyên mirovên reben, ku diwêre bila here Ülkerê."

Duran jî bo medyaya alternatîf jî diyar kir ku, patronên baş tune ne, divê xwendevan û temasevan xwe bi rêxistin bikin, beşdarî rêveberiya rojnameyan bibin. Duran wiha got: "Li welatên demokratîk 'karta zer' jî aliyê sendikayên rojnamevan ve tê dayîn. Li Tirkîyeyê wî karî dewlet bi cih tîne. Lê ji bo doktor û parêzeran ode û baro vî karî dikin."

EŞREF SİDAR

TÎŞK



ŞÜKRÜ GÜLMÜŞ

Nivîsa nivîskarê me negihaye me.

Ji bo aştiyê çalakiyek

Her çiqas dewleta tirk şerê qirêj bidomîne û rojekê jî roja din bêhtir xwîna mirovan birjîne û dev ji serhişkiya xwe bernede jî, daxwaza aştiyê di dilê mirovên welatparêz de xurt dibe. Dezgeh û sazîyên ku li dijî vî şerê qirêjî ne jî, roj bi roj çalakiyan li dar dixin û daxwazên xwe yê jî bo aştiyê derdixine pêş.

Yek ji van çalakiyan jî, ji aliyê Komîsyona Ciwanan a Partiya Demokrasiya Gel (HADEP) ve roja 11'ê rêbendanê 1997'an de li avahiya HADEP'a Bağcılarê hate lidarxistin.

Programa Şahiya Aştî û Azadiyê saet di 14.00'an de bi axaftina

pêşkêşvan (bi tirkî û kurdî) vebû û bi koma Serhildan a Govedê ku komek ji Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) ya Stenbolê ya dest pê kir. Koma Serhildan bi cil û bergên xwe yê gelêrî û rengên xwe yê kesk û sor û zer çend govend ji herêma Amedê pêşkêşî mêvanan kirin.

Bi dû re Komîsyona Ciwanan a HADEP'ê şaxên Avcılar, Gebze, Kağıthane yê skêcek pêşkêşî mêvanan kir û Koma Çiya (ya NÇM) bi stranên xwe yê balkêş derket ser sehneyê û mêvan vexwendin dîlanê. Koma Çiya stranên xwe yê bi kurmançî û dimilkî pêşkêş kirin û got: "Bêyî aştî jîyan nabe." Pişt re jî Komîsyona Ciwanan Koma Botan skêcek leyist û bal kişand ser rojnamegeriya kurdî û Apê Mûsa.

Pêşkêşvan ku berî kom derkevin ser

sehneyê mesajên ku ji bo aştiyê hati-bûn birêkirin (şandin) xwendin. Piraniya van mesajan ji aliyê şaxên HADEP'ê yê Stenbol û zanîngehên li Stenbolê hatibûn birêkirin. Yek ji wan jî ya ciwanên azad û welatparêz ya Zanîngeha Dicleyê bû. Xwendina mesajan bi dirûşmên (sloganên) wekî "Şehîd namirin", "Bimire koletî, bijî azadî" û "Berxwedan jiyane" qediya. Beşa yekemîn bi vî awayî xelas bû.

Piştî ku ji bo yê bi rojî 10 deqeyan navber hate dayîn, şahiyê bi danîşana dîayê dest pê kir. Di dîayê de wêneyên ji Kurdistanê (Etrûş, Licê, berxwedanên Zîndana Amed) û serhildanên li metropolên Tirkîyeyê pêşkêşî mêvanan kirin û ji aliyê din jî

helbestên bi kurdî û tirkî xwendin ku pir bala mirovan kişandin û hate ecibandin. Nîşandana dîayê bi daxwaza Apê Mûsa ya ku ji kurdan kiribû xelas bû. Apê Mûsa digot:

"Ez niha 75 salî me, sibê tune me Ji kurdan daxwaziya min ew e ku, min di gora min de rehet bikin."

Bi dû re di nav çepik û nîşanên serkeftinê de Koma Agirê Jîyan (ji NÇM'ê) derket ser sehneyê û çend stranên bi kurdî pêşkêş kirin û bernamêya xwe bi strana "Gerîla rojbaş" qedand. Nêzî 1300 mirovî ku di nav wan de dayik û zarok jî hebûn bi dilxweşiyeke mezin beşdarî ve çalakiyê bûn.

SEVDA ELDEMİR



# Çiroka Ehmed Beg û Silêman Begê

**S**ilêman Beg axayê Kela Wanê, Ehmed Beg ji axayê Kela Mûşê ye. Wan her du axayan destê bratiyê dane hev heya ku li dinyayê sax bin. Di her hêlê de alikariya hev dikin û tu carî jî xiyantê bi hev re nakin. Di her şer û cengê de jî alikariya hev dikin. Bi vî awayî destebiratiya hev dikin. Wekî jî dê û bavekî bin.

Rojekê ji rojan Silêman Beg axayê Kela Wanê, gazi dike xulamên xwe û dibêje: "Ev heft sal in me xerac û xerc ji gelê Wanê nemandiye. Ji ber wê yekê xwe amade bikin hespê min jî amade bikin ku em herin xerc û xeraca bistîm." Lê belê xeberê nade destebirayê xwe. Piştî ku tevahî amedekariya xwe dike, berê xwe dide rîya Wanê.

Cemîle Xanim keçika zilamekî artêşa dewleta Osmanî û pîreka Silêman Begê ye. Cemîle Xanim piştî ku Silêman Beg ji mal derdikeve, li ser navê Silêman Begê nameyekê ji Ehmed Begê re dinivîse. Di nameyê de wiha dibêje: "Ehmed Beg bira, ev heft sal in me xerc û xeraca aliyê Wanê nestendiye. Nesekine zû were, emê herin xerc û xeracan bistînin." Dema ku name digihêje destê Ehmed Beg, ew jî gazi zilamên xwe dike û dibêje: "Zû b'kin, amade bin emê herin Kela Wanê, destbirayê min xeber şandiye pey min." Bi vî awahî amade dibin û bi rê dikevin. Li hespên xwe siwar dibin û berê xwe didin Wanê.

Lê belê Cemîle Xanim bi çar çavan rîya Ehmed Begê dipê, ka wê kengê bête.

Rojekê bi mexrebê re Ehmed Beg diçe Kela Wanê. Cemîle Xanim jî tevî xulamên xwe tene pêşiya wî û wî derbasî odeya mêvanan dikin, qedir û qîmetê jê re digirin. Ehmed Begê jî Cemîle Xanimê dipirse: "Kanî destbirayê min Silêman Beg?"

Cemîle Xanim wiha bersiva wî dide: "Ku tu dereng mayî, Silêman Beg temiya te li min kiriye û gotiye ku bila li mal be heta ez bizivirim."

Ehmed Begê got: "Baş e." Lê di nava xwe de jî gelekî aciz dibe. Belê hemû kesên ku di kelê de bûn tevî Cemîle Xanim ji Ehmed Begê re heta nivêşevê xizmet dikin.

Cemîle Xanim ji xulamên re dibêje: "Ehmed Beg nikare li odeya mêvanan rakeve. Bila Ehmed Beg here li odeya Silêman Beg rakeve û li rehetiya xwe binêre." Ehmed Beg radibe diçe odayê. Piştî ku Ehmed Beg bi cih dikin, hemû xulam jî dikevin razanê.

Cemîle Xanim ji odeya xwe radibe û



diçe odeya Ehmed Begê. Wexta ku Cemîle Xanim diçe odayê, Ehmed Beg ji cihê xwe radibe û jê dipirse: "Xêr e tu hatî?" Cemîle Xanim dixwaze tîkiliyan bi Ehmed Begê re çêbibe. Ehmed Beg qebûl nake û dibêje: "Tu wekî xwişka min î." Cemîle Xanim dibêje: "Ger tu tîkiliyan bi min re daneynî, ezê serê kurê xwe yê biçûk hilkim û ezê bi qîr û hawar kim, wê wextê bavê min ê were serê te jêke. Dema ku Silêman Beg jî bête malê, ezê bibêjim; 'Gava ku tu ne li mal bûyî, destebirayê te hate malê, me qedr û qîmetê jê re girt û wî jî dixwest bi min re tîkiliyê dayine, min jî qebûl nekîr, rabû serê kurê min hilkir, me jî Ehmed Beg kuşt.'"

Ehmed Beg ji Cemîle Xanimê ra dibêje: "Xwişkê, ev tîkilatî qebûl nabe."

Cemîle Xanim radibe serê kurê xwe hildike û dike qêrîn û berê xwe dide odeya bavê xwe. Ji bavê xwe re vê bîbextiyê dibêje. Bavê wê radibe şûrê xwe hildide û berê xwe dide odeya ku Ehmed Beg lê raketiye. Gazi wî dike û dibêje: "Bêbextî di navbera min û te da tune ye."

Ehmed Beg ji bavê Cemîle Xanim re dibêje: "Bi xebera wê nekî. Cemîle

bêbextiyan dike. Wê bi xwe serê kurê xwe hilkir." Lê belê bavê Cemîleyê îqna nebû. Ehmed Beg lê nihêrt ku wê wî bikujin. Ehmed Begê şûrê xwe kişand û kete nav wan, serê bav û birê Cemîle jêkir. Cemîle Xanimê jî dişa xwe veşart û filitî.

Ehmed Begê gazi xulamên xwe kir û li hespên xwe siwar bûn û berê xwe dan Kela Mûşê û hat mala xwe. Lê belê zane ku wexta Silêman Beg bizivire malê wê Cemîle Xanim hemû tiştî bi bêbextî bixe stûyê wî. Ev jî wê bibe sedema di şerê navbera wî û destebirayê wî de. Ehmed Beg bi wî awahî raman dike û ji xulamên xwe re dibêje: "Wexta ku we di Silêman Beg hat, xeberê bidine min." Ehmed Beg ma li Kela Mûşê. Emê niha jî werin ser mesela Silêman Beg û Cemîle Xanimê.

Silêman Beg wexta berhevkirina xerc û xeracan li aliyê Wanê diqedîne û berê xwe dide malê, Cemîle Xanim jî maye li hêviya wî. Wexta Silêman Beg tê ber deriyê Kela Wanê ku derbasî nava kelê bibe, Cemîle Xanim şarika reş li serê xwe girê dide û bi her du destan li xwe dixê û xwe berdide pêşiya Silêman Begê bi qêrîn û hawar. Cemîle Xanim jî

Silêman Begê, re dibêje: "Te her dem ji min ra digot: 'Ehmed Beg ji birayê min î dê û bavê çêtir e.' Belê ne wisa bû. Piştî ku tu çûyî xerc û xeracan aliyê Wanê, Ehmed Beg hate malê. Ji bo ku tu ne li malê bûyî jî, ji bo xatirê te me jê re qedr û qîmet girt. Me ew bir li odeya te da razandin. Di dewsa te de min kurê xwe da ber milê xwe û ez çûm odê da ku pîrsa hewcedariyên wî bikim, bê ka çi hewcedariyên wî hene. Wî jî daweya tîkiliyê ji min re kir, min jî qebûl nekîr. Dest avête kurê min û serê kurê min jêkir. Ez jî bi zorê filitîm û min gazi bav û birayê xwe kir. Wexta bav û birayê min çûn ba wî, Ehmed Beg serê bav û birayê min jî jêkirin."

Wexta Cemîle Xanim van gotinan ji Silêman Beg re dibêje, Silêman Beg bi hêrseke mezin berê hespê xwe dizivîrîne û berê xwe dide Kela Mûşê, ji bo şerê Ehmed Begê. Çimkî ji gotina Cemîle Xanimê bawer kiriye. Wexta ku diçe nêzikî kelê, xulamên Ehmed Begê xeberê didinê û dibêjin: "Were Silêman Beg hat." Ehmed Beg radibe xwe berdide pêş û jê re dibêje: "Ez li bextê te me tu bawer nekî ji gotinên Cemîle Xanimê. Tiştê ku Cemîle Xanimê ji te re gotine hemû bêbextî ne. Navbera min û xwe xerab neke. Tu jî zanî, ez ne xwe-diyê vê yekê me."

Lê Silêman Beg jê bawer nekî û şûrê xwe kişand û avête Ehmed Beg. Ehmed Beg bi du derbeyên şûr birîndar bû. Dîsa jî nedixwest destbirayê xwe Silêman Begê bikuje. Belê çare nedît. Silêman Beg îqna nekîr. Şûrê xwe kişand û avête serê Silêman Begê û serê wî jêkir.

Ehmed Begê bi birîndarî berê xwe da Nexweşxaneyê Bilîsê. Di nexweşxaneyê de nameyekê li ser navê Silêman begê ji Cemîle Xanimê re dinivîse û di nameyê de dibêje: "Min Ehmed Beg kuşt, ez jî bi du derban birîndar im, nesekine zû were."

Wexta ku name dikeve destê Cemîle Xanimê kêfa wê pir tê û berê xwe dide Nexweşxaneyê Bilîsê. Gava ku Cemîle Xanim digihêje nexweşxaneyê, Ehmed Beg wê dibîne û bi kezîkên wê digire û serê Cemîle Xanimê jê dike. Ji ber ku Cemîle Xanim bûbû sedema kuştina destebirayê wî. Piştî vê yekê Ehmed Beg êdî nexwest bijî. Şûrê xwe danî erdê û xwe avête ser şûr û xwe jî kuşt. Bi vî awahî xwe kire qurbana destebirayê xwe Silêman Begê.

BERHEVKAR: OSMAN ÜZÜM

## Nûbûn

**Nûrê, ligel ku rengê cazê di xebatê de pir li pêş e, bi xencereya xwe ya kurdî kiriye ku mirov zû bi zû bi "guhêrînê" nehese û lome li xebatê neke. Li dawiyê jî xebateke azmûnerî ya serketî derketiye holê.**

**M**uzîka kurdî, çî li welêt û çî jî li derveyî welêt ketiye qonaxeke nû. Di vê qonaxê de berhemên nû û balkêş jî derdikevin ber muzîkhezan.

Nûbûn yek ji wan berheman e ku ji aliyê Koma Nûbûn ve hatiye amadekirin. Koma ku navê xwe daye kaseta xwe, di sala 1989'an de ava bûye. Di vê komê de tenê muzisyen Nûrê kurd e. Hersiyên din jî biyan in.

Tiştêkî din î balkêş ev e ku, di komê de zilamek jî nîn e. Hemû jin in.

Nûrê bi dengê xwe, Tina Wrase bi soprano saksafon û basklarnetê, Satyam bi dombakê û Veronika Vogel jî bi gîtarê di komê de cih digirin.

Di kasetê de tevî hev neh parçe hene û tev jî bi kurmancî ne. Ji van tenê du berhem ên komê ne: Em (îsal jî buhar nehat), ku gotinên wê aîdî Nûrê û muzik jî ya komê ye. Berhama din jî bi navê "Bukalemun" e.

Stranên din hin ji wan gelêrî

(anonîm) ne û yên din jî yên nû ne ku li ser destgeh (meqam), pîvan, ritm û qeydayên muzika kurdî hatine çêkirin. Navên van stranên ev in:


Leyla, Wele te nagrim lo, Ax lê yeman Çaçanê, Rabe lawo, Dîlberam dîlber, Nînnô, Ey şêrîn yarê.

Berhem bi awayekî nû, jî nû ve hatine strandin. Her wiha, ligel vê yekê amûrên (enstrûmanên) ku jî muzîka kurdî re biyan in jî hatine bikaranîn.

Ji bilî van yekan, endamên komê zêde bi pîvan û qeydayan ve girêdahî nemanê û jî xwe gelek tişt tevî xebatê kirine.

Nûrê, ligel ku rengê cazê di xebatê de pir li pêş e, bi xencereya xwe ya kurdî kiriye ku mirov zû bi zû bi "guhêrînê" nehese û "lome" li xebatê neke.

Em bi hêsanî bibêjin ku Nûrê dengê xwe û taybetiyên xencereya kurdî li amûrên biyan neaniye,



Çêkirin: Trikont Ltd.  
IMÇ. 6. Blok NO: 6533 Unkapani Stenbol  
Tlf: (0212) 5271859

amûr li muzik û xencereyê anîne. Bi ya me helwesta rast jî ev e.

Dengê amûrên saz û cûrayê, biyanîtiya amûrên wekî soprano saksafon û basklarnetê jî navê rakiriye û çêj û rengêkî xweş û delal (ligel wan) daye berhemê, bi awayekî gelemperî. Li dawiyê, dikare bê gotin ku xebateke azmûnerî (tecrûbî) ya serketî derketiye holê.


M. RONAK

## Jiyana Rewşen

**K**ovara edebî, çandî û hunerî ya Navenda Çanda Mezopotamyayê Jiyana Rewşen, hejmara xwe çaran pêşkêşî xwendevanên xwe kir.

Di vê hejmara nû ya kovara mehane ya Jiyana Rewşen de, mijarên ji hev cihê hene.

Kovare di berga xwe yê pêşîn de cih daye nîsa li ser Feqiyê Teyran ku P. Elîxan û Seîd Karesî li ser dem û cihê jî-dayikbûna wî, nasnavên wî, çaxê mirina wî radiwestin. Samî Berbang jî ev nivîsa hanê ji alfabeya kurdî ya erebî wergerandiye ya latînî. Nivîsa din jî bi navê "Romantikê Mezin Viktor Hugo û Hunera Wî" ye, ku ji hêla André Lagarde-Lavrend Michard ve hatiye nivîsin. Ev nivîseke tehlîlî ye û Cemil Denli ji fransî wergerandiye kurmancî.



Di hejmara nû de ji bilî du nivîsan (yek jî hevpeyvîna bi Avşar Timuçin re û ya din jî nixandina Elif Genco ya li ser filmê 'Eşkiya' ye), hemû nivîs bi kurmancî ne. Ji nivîsan çend nîmûneyên balkêş:

"Destgeh û Amûrên di Muzîka Kurdî de" Zana Farqînî, "Melayê Cizîrî" F. Huseyn Sağnuç, "di Germîna Şevê de Hîv û Av" Müslüm Yücel (wergera ji tirkî Cemil Denli), "Estetîka di Hunerê de" Zahir Kayan, "Dilekî ji Nû ve Şiyarbûyî" Hesen Zinar û hevpeyvîna bi Adnan Yücel re.

kes jê nema li rûyê erdê. Di gel ku wî gelek jin anîn û pir zarok jê peyda bûn. Wekî Sulêman û Ebdurehman û Elmuhacir. Kitêbên dîrokî dibêjin ku Ebdurehamn bi destê Muawiye bi jehrê hate kuştin û Elmuhacir piştigiriya îmam Alî kir; di şerê Sîffîn de hate kuştin û li gorî van bûyeran xwediyê pirtûka "Nihayetul Ereb" wiha dibêje: "Zarokên Xalid tevde qir bûn û tu kes ji wan nema, ne li rojhilat û ne li rojava û çî kesê ku doza nevîtiya Xalid dike, ne rast e û derewan dike!!"

Qelqêşendî dibêje: "Nîjadnas tevde dibêjin ku zarokên Xalid qir bûn."

Xwediyê pirtûka "Usdulxabe fi merîfet el sehabe" dibêje: "Zarokên Xalid qir bûn û tu kes ji wan neman û malên wan li Medîne bû mirat û kete destê Eyûb kurê Seleme."

Lê tiştê seyr û ecêb ew e ku, Şerefxanê Bedlîsî di Şerfenameya xwe de tersî van hemûyan dibêje. Ew dinivîse: "Ji gotinên dîrokzanana xuya dibe ku muheqeq mîrên Cizîra Botan ji nîjad û nesla Xalid kurê Welîd in û yekemîn kesê hukmê Cizîrê kir Suleyman kurê Xalid e."

Ne tenê mîrên Botan, lê mîrên Baban jî xwe dikirin neviyên Xalid kurê Welîd. Lê ev yeka hanê ne rast e û wekî me da xuyakirin tu carî kurdîtiya mîrên me ne cihê şik û gumanê ye. Eger tiştêk wisa hebe, mîrên me yên herî navdar ereb in û tu dîrok ji me re namîne.

Wate: Nîfşên miletan di bin fermana wî de bûn. Koka wî ereb bû lê mîrê kurdan bû, bavanên wî yên mezînan û kalikên wî... digihên Xalid. (Mem û Zîn malik 364-367)

Ew di malika 1187'an de wilo dibêje: Sondê dixwim ez bi rûhê walid Heta bigihêje zedê Xalid

Ango ez bi gîyanê bavê xwe sond dixwim û heta bi kalkê xwe Xalid.

Di destana Memê Alan de jî em li tiştêkî wisa rast tên, di wê destanê de (Memo) jî Eşîra Qureyş e! Di demên berê de hakim û mîrê her derê jî xwe re li nijadêkî pak digeriyan.. Ma çî nijad û esl jî Eşîra Qureyş çêtir hebû ku Muhemed (Pêxemberê Xwedê) jî wê eşîrê bû?! Ji ber vê yekê mîrên kurd ên Cizîra Botan rabûn xwe kirin neviyên Xalidê kurê Welîd ku ji ateya mexzûm e û ew ate bi xwe jî, ji eşîra Qureyş e.. Xalid yek ji eshebeyên pêxember bû û serokekî jîr û jêhatî bû, ku di tu şerî de neşikestibû. Çî di îslamê de û çî di jîyanê kafiriyê de (cahiliyetê de).

Mîqdad Midhet Bedirxan di hejmara yekemîn a rojnameya Kurdistan de wiha dibêje: "Ey alim û mîrên kurdan... hûn tev dizanin esl û neseba min çî ye? Kalikê min Xalid kurê Welîd e..!" Lê dema em van gotinan bidin ber ronîya rastiyê û li jêderkên dîrokî yên îslamî vegeerin, emê li çî rast bîn?! Ev jêderk hemû dibêjin ku nesla Xalid kurê Welîd qut bû û tu

## Mîrên Botan

### û nevîtiya Xalid Ibnul Welîd

JAN DOST

**Q**ureyş, eşîra herî navdar e di dîroka erebî û îslamî de. Ji ber ku Hz. Muhemed jî wê eşîrê bû û Quran bi zaravayê Qureyş e...Û piştî mirina Hz. Muhamed bi çend saetan gotinek peyda bû, û wê roleke girîng di dîroka îslamê de lîst, ew gotin ev bû: "Îmam ji Qureyş in." Ango serok û hakimên dewleta îslamî divê tenê ji Eşîra Qureyş bin. Û bi vî awayî, vê eşîrê nêzîka heft sed salî hukim kir.

Di dawiya serdema Ebasiyan de gelek kesan (tevî ku ne ereb bûn) xwe ji Eşîra Qureyş hesibandin. Da ku duristiyê ji hikumdariya xwe re peyda bikin. Hinek ji van kesan jî mîrên Cizîra Botan bûn. Di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de ev tişt diyar dibe. Xanî di pesnê Mîrê Botan (Zêndîn) de wiha dibêje:

"Ecnasê mîlet mutî û munqad  
Nesla wî ereb emîrê ekrad  
Abayê izam û Cadê walid  
mensûb û muselselê di Xalid



# Çen mînak ji pêkenokên kurt

## Tir li ku û das li ku

Seremeleyek (serokê palevanan) rojekê das li lingê xwe xist, rabû yekî pale jê re got:

- Tu dibêji 'Ez zîrek im', çawa te das li xwe xist malxerab?

Seremele lê veğerand û jê re got:

- Ma te çima wê rojê tirek kir?

Yê din bersiva wî da û got:

- Tew tew, tir li ku û das li ku..?

## Gur û şivan

Gur kerê şivan kuşt. Şivan çû nik gur gîlî û gazin jê kirin, gur rabû ev helbest jê re got:

Heger jina te benek birista

Û di lingê ker de bixista

Wê çawa gur kerê te bikuşt.

## Behlûl

Yekî xwest ji xwe re jinekê bîne, çû nik Behlûl jê re got:

- Seyda ez dixwazim tu ji min re bê-jî ez jineke çawa bînim?

Behlûl li darekî siwar bû, bi bayê bezê jê re got:

- Heger qîz be tu zanî, heger bî be ew zane, heger kudik (gede) li pî be, hilîne hespê min li te neterpile, ez çûm.

## Bêjntûtik e û malrûtik e

Ya qereçî derbasî malekê bû, ji bo ku geşta xwe bistîne ard xwest, kebanîya malê got: "Tune."

Ñan xwest, nîsk û nok xwest, bermali her sond xwar ku tiştek di mal de nîn e. Ya qereçî dide mandelê û rûyê xwe diqerçimîne, bêhêvî derdikeve.

Çawa ya qereçî derdikeve, malxweyê malê di derî de tê, dinihêre ku çî xortekî xweşik î dirêj î tîl, cilên wî nû, rabû jê re got:

- Wey qurbano, bejnziravo, bejntîlo, jintaziyo, jinbirçiyoy, malrûtiko.

## Koçer û helaw

Yekî Amûdî trektora xwe dibe hêla koçeran, dibîne ku kîvroşk pir in, diçe bajarê Dêrikê xefikeke kîvroşkan dikire, talikekê dixê devê xefikê û li ber kîvroşkan vedide.

Beyanî tê dinihêre ku tu tişt neketiye xefikê, li xweşa wî naçe. Hevalê wî jê re dibêje: "Here bin çadira koçeran hinek helaw bîne deyne ber devê xefikê."

Bi ya hevalê xwe dike û beyanî tê dibîne ku va ye mirovek di xefikê de ye..?

## Kefendiz

Li Amûdê kefendizekî bi nav û deng, her tim kefenan didize û her kes jê re sixêfan dike. Çaxa ku dimire, kurê wî dest bi dizîya kefenan dike û darekî ji dixê devê mîriyan..! Vêca gelê wê hêlê digotin wey sed rehmî li tirba kefendize berê be.

Ji BAŞÛRÊ BIÇÛK:  
ABBAS ISMAIL

## Tilkilerim ağıyor

Mirovekî kurd temenî wî li dora 50 salî bûye, nexweş dikeve. Roviye wî diêşin. Jina wî jê re dibêje: "Ji ber ku tu bi tirkî nizanî, bila lawik jî bi te re were!"

Miho hêrs dibe û waha dibêje: "De here, tu dibêji qey ez zarok im bi tirkî nizanîm." Û diçe doktor.

Dema Miho diçe nexweşxaneyê bi zikê xwe digire û dike zarezar: "Ayyy ayyy ay li mino bavo."

Doktor tê Miho dibe oda xwe. Miho dîsa dike nalenal: "Ayyy ayy, ay li min bavo, ay li min bavo." Doktor bi milê Miho digire wiha dibêje: "Söyle bakalım neyin var?"

Miho destê xwe dide ser zikê xwe û dibêje: "Hima aha burası ağnyorsun."

- Orada bir sürü şey var; midem mi ağnyyor, bağırsakların mı, neren ağnyyor?

- Bi serê bavê te benim tilkilerim ağnyorsun.

Li ser vê yekê doktor reçetekî dinivîse û dide miho û waha dibêje: "Al bu merhemi tilkinin ısırdığı yere sür."

## Zarokê ku sola wî 45 nimro ye

Li gundekî Kurdistanê gerîla diçin malekê. Dema gerîla li derî dixin, zilamê malê ji pîreka xwe re dibêje: "Ka binêre ew kî ne?" Pîrek, diçe ber derî û dibêje: "Ew kî ne?"

Gerîla bersivê didin: "Em in, em he-

val in." Pîrek diçe ji zilamê xwe re dibêje: "Weleh heval in."

Zilam dibêje: "De ka ezê bikevime dergûşê tu lihêfê biavêje ser min, ku gotin ew kî ye, bibêje kurê min e."

Zilam dikeve dergûşê, pîreka wî lehi-fê diavêje ser û derî ji gerîlayan re vedike. Dema gerîla rûdinin, pîrsa zilamê malê dikin.

Pîrek: "Zilamê min çûye bajêr."

Çavên gerîlayekî bi dergûşê dikeve. Dema ku baş li dergûşê dinihêre, dibîne ku pêlaveke 45 nimro di binê lihêfê de dixuye.

Gerîla radibe ser xwe û ber bi dergûşê ve diçe û ji pîreka malê dipirse: "Ev kî ye?"

Pîrek: "Kurê min e, razaye."

Dema pîrek wisa dibêje, gerîla lihêfê hêdika ji ser dergûşê hildide û dimêze ku çî bibîne.

Gerîla: "Maşallah piyê vî çî mezin in, pêlava 45 nimro dixê piyên xwe."

Pîşt re tiliya xwe ber bi devê zilamê dibêje:

- Gîzê gidi gidi, wî simbelê wî jî hene. Xwedê xwedî bike, wê mezin bibe, bibe gerîla. Paşê wiha dibêje:

- De rabe ser xwe, mala te xerabe, tu şerm nakî tu xwe ji ber me vedîşêrî.

\* Ji Girtîgeha Bartînê ev pêkenok ji me re bêyî nav hatine şandin.

## BIXELAT...

## XAÇEPIRSA BIXELAT (51)

## XAÇEPIRSA

A	F	C	H	V					
E	L	M	D	A	R	E	L	A	T
A	H	A	M	A	D	E	Y	?	
Ü	M	E	D	E	N	I	Y	E	T
K	E	W	K	A	W	A	A		
E	R	D	B	A	A	N	I	N	
A	N	I	N	A	N				
A	T	A	R	T	N	E			
E	M	A	N	E	T				
A	R	I	N	M	I	R			




### Bersiva Xaçepirsa 49'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 51'an pirtûka "KEVOKA SPÎ" ya Firat Cewerî ye.

### KEVOKA SPÎ

Firat Cewerî




**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 49'an, pirtûka ÇAXOV "Baxçeyê Vişna" qezenc kirine: Zekî Bazîdî/ Bazîd, Handan Kebude/ İzmîr, Sabîh Gümüşsoy/ İzmîr, Jiyan Ronîzêr/Batman, Dîlfîkar Döğêr/ Amed

Hunermen dek (wêne)	Strî, xar	Tipeke kurdî	Kûçîk	Nebaş kîrê	Erd, qad
Nêrê mihan	Radon	Rêxistinêk e leşkerî	Rûbarek li Misrê	Şîmal	
5		Leheng, qehreman			1
Mîrovane		Danasîn		Aşêf temandin	
Amûrekî muzîkê				Cejn	
	Cureyekî fontên nivîsinê				Xwedayekî Misra kevin
	Pîştevan				
Boğe - Karkerê çandinîyê		Osmînyûm	Hesrest, keser		6
		Qertafek	Cinavke îşarkî		
		Vexwarnasereke		Parçeyekî pé	
		Dîjî		Sersala filehan	
Yadkîrtin					
Paqij, çê	3				
		sembola Noodlyûm		Oksîjen	
Dahatîna kîrê					
Bi kevanê tê avêtin			4		
		Rojek		Tipek	



PEYVA VEŞARÎ





# Welatperêzê bê tirs Remzî û Operasyona Mamût

Destpêk Rûpel 8-9

Raporê Müller bala Adolf Hitler jî dikişîne. Ew vê raporê hewaleyî Keitel dike û destpêka emrê haziriyê dide. Ferdmarea emir dide Müller ku dest bi haziriyên bike. Lazmatiyên ku girîng in kare bistîne û çiqas mirov diwaze kare bibe.

Dema plana vê operasyonê tê çêkirin, artêşa alman li ber Bakûyê ye. Pêşengên leşkeran mîneralên petrolê dibînin, lê nikarin bi pêş bibe. Keitel, di bersiva xwe ya ku dide Müller de dibêje ku li Iraqê gelek ajanên wan hene, lê pirên wan dualî dixebitin. Ji ber vê yekê, ji herêmê malûmatên rast nikarin bistînin.

Li Îranê jî li bajarên Tehran, Îsfahan, Şiraz û Tewrêzê gelek şebekên wan hene. Di nav eşîrên lûr û bextiyarî -ku ev kurd in- û qesaxiyî ku ew jî azarî ne, gelek mirovên wan hene û ew karin bikevin her derê û derkevin.

Naziyan di meha pûşpera 1943'yan de li Îranê gelek operasyonên hewayî çêkirine û gelek ajanên xwe berdane Îranê.

Alîkarên almanan di nav ereban de jî gelek bûn. Dostê almanan ê herî mezin Mişel Eflaq bû, ku ew sazûmankarê Partiya Baas bû. Dîsa îdeologên faşîstên ereban Sadiq Sansal jî yek ji wan bû. Wî, ji Kendava Ereban heta Atlantîkê erebistaneke mezin diparast û neyarê kurd û îngilîzan bû. Wî digot piştî ku îngilîz ji herêmê bên derxistin, wê kurdan hemû asîmîle bikin.

Eleqeta nav almanan û Iraqê di warên din de jî dom dikir. Di dîroka 4'ê avrêla (nîsana) 1941'ê de tarafdarê nazîyan Reşîd Alî Xeylanî li Bexdayê darbeyek li dar xist. Ji Almaniyayê alîkarî xwest. Sovyetê û Partiya Komunistên Iraqê jî hikûmeta Reşîd Alî nas kirin. Lê berî ku alman bigihîjin alîkariya wî, artêşa îngilîz di meha gulanê de ketin Bexdayê.

## Dagirkirina Îranê

Rejîma Îranê di destpêka şer de bi Almaniyayê re tîkiliyên baş danibûn. Îran wekî koloniyekê almanan bû. Ew tîkîlî jî bo hevalbendan gelek bi talûke bû. Ji ber vê yekê Îran di gelawêja (tebaxa) sala 1941'ê de nivî jî aliyê îngilîzan ve û nivî jî, ji aliyê Sovyetê ve bêberxwedan hate dagirkirin.

Kurdistan bi piranî li herêma dagirkirî ya sovyetê mabû. Şah wekî kûklayekê bû. Her çiqas di bin dagirê de be jî, artêşa Îranê alîkara

Almaniyê ye. Gelek general jî bo ku dest bibin xwe, li benda artêşa alman in ku, ew ji Kafkasa ber bi jêr dakevin. Ji ber wê yekê îstixbarata alman, li hemû Îranê gelek haziriyên xurt dimeşîne. Hemû eşîr û serokên olî, bi leşkeran re tîkîlî danîne. Bi sedan ajanên alman di nav wan de serhildaneke pêşerojê li dar dixin. Piştî ku şer li dijî almanan diqede, ew ajan bi şertê ku neyên kuştin, hemû tîen teslîmkirin.

Li gorî planê wê serhildana Îranê û ya başûrê Kurdistanê bi hev re dest pê bike. Heta Misir, Filîstin û Iraqê jî, bi kurtayî li hemû Rohilata Navîn ve hêvî û xebatê dest pê kiriye. Ew dixwazin vê herêmê hemû bi carekê re ji îngilîzan bistînin, lê dîsa bi alîkariya gelên wan deran.

Müller jî, ji bo operasyona xwe qerergaha xwe li tixûbê Îranê, li herêma Silêmaniyê wê deyne. Ev der ne dûrî bîrên petrolên Kerkûkê ne. Û ev bajar merkeza welatparêzan e. Serokê Hîwa Refîq Hilmî, Mele Mîstefa Barzanî û gelek şexsiyetên naskirî li vir in.

**“Min xewnek dît ku li ser Ferat û Dicleyê du qertel difirin û rastî şerekî tîen û xurikê devê wî jê distînin.” Çavê Remzî dibiriqin û ji Müller re, “Baş e” dibêje. Şêr îngilîz in û qertel Müller û Remzî ne. Xurikê devê şêr jî Kurdistan e.**

Keitel, emir dide Müller ku ew bilezîne. Lewre li herêmê her dem dibe ku guherîn çêbibe. Ev Keitel, wê piştî şer, di sala 1946'an de ji ber ku sûcdarê şer bû û fermana gelek kuştina dabû, ji aliyê Dageha Sûcdarên Şer a Nürnbergê hate îdamkirin.

## Müller bi kurdî hîn dibe

Müller, ku emir digire dest bi xebatê dike. Li ser Kurdistanê çiqas çavkanî hene dixwîne. Mirovekî pîr dibîne ku ew berê li Kurdistanê maye û bi kurdî zane. Müller, ji vî mirovê alman kurdî hîn dibe. Ew operasyon di jiyana wî de dibe perdeyeye ku.

Hevalên xwe yê ji gruba ku wê xwe biavêje Kurdistanê û lazmatiyên operasyonê amade bike, ji nav mirovên ku bi zîmanê erebî, farisî dizanin hildibijêre. Dema van haziriyên, rûbê-

ya wî ya leşkerî miralay e.

Endamê grubê tev jî îstixbaratê ne. Yek ji wan bi navê Hofman e û ew pisporê şerqiyatê ye, demekê jî di Zanîngeha Tehranê de mamosteyî kiriye. Yekî din jî bi navê Koneshin e û zabîtek e. Di qefleyê de topografek û astrologek jî heye, ku ew li Misirê bi Generalê Alman Romel re xebitîne. Hinek muhendîsên petrolê û endûstriyê jî di nav wan de hene ku, ewê piştî serhildanê wan bîrên petrolê ku di şer de xesar dîtîbin saz bikin.

Ew li tixûbê Sloveniyayê li dibistaneke leşkerî, bi dizî perwerdeya vê operasyonê dikin. Ew, car caran jî diçin Berlinê perwerdeya bêtelan û bikaranîna bombeyan dibînin. Li Neustadta Wiyanyayê jî tatbîqatên paraşûtan dikin. Bihara 1943'yan e.

Pêşengê grubê wê here başûrê Kurdistanê, îstixbaratê bicivîne, bi serokên kurdan re tîkîliyan deyne û şertên serhildanê hazir bike. Pêşengê din jî bi destpêka operasyonê re wê xwe bi paraşûtan berdî herêmê.

## Hewcedarî bi kurdekî heye

Lê jî bo vê operasyonê hewcedarî bi kurdekî heye. Divê ku ew jî başûrê Kurdistanê be. Ku ew Kurdistanê baş nas bike, neyarê îngilîzan be û jî bo rizgariya Kurdistanê bi almanan re bixebite.

Müller li hemû Ewrûpayê li kurdekî wisa digere, lê nikare peyda bike. Stenbol tê bîra vî. Ji îstixbarata Stanbolê dipirse, ka ew yekî wisa karin bibînin an na. Û bersivê distîne, belê yekî wisa heye. Ew mirovê ku Müller lê digere, navê wî Remzî Nafî Reşîd e.

Dema ku Müller li kurdekî digere, polîsên tirkên jî li Remzî digerin. Hevalekî wî, ji zanîngehê wî dibe Konsolosxaneyê Almaniyayê, ku ew hevalê wî ajanê Almaniyayê ye. Hatina Remzî jî bo almanan wekî derman e, hema bi posaportekê sexte wî dişînin Berlinê. Müller li benda wî ye. Müller, gelek di bin tesîra Remzî de maye. Wî bi van kelîmeyan tarif dike:

“Welatparêzêkî saf ê gelek bêtirs.”

Piştî ku di nav wan de samîmîyet çêdibe, armanca xwe jê re wisa tîne zîman: “Min xewnek dît ku li ser Ferat û Dicleyê du qertel difirin. Û rastî şerekî tîen û xurikê devê wî jê distînin.” Çavê Remzî dibiriqin û ji Müller re, “Baş e” dibêje. Şêr îngilîz in û qertel Müller û Remzî ne. Xurikê devê şêr jî Kurdistan e.

Domahik heye

# Etrûş li ber xwe dide



Zivistana Kurdistanê ya giran li derî die. Heke biryar bi şûn ve neyê girtin, di serî de zarok, gelek penaber wê ji serma û birçîna, bimirin. Hê wext heye ku mirov rê li ber vê karesate mirovî bigire. Divê ev demsal ji penaberên kurd re nebe demsala êş û azarê.

**R**eaksiyona li hemberî biryara Komîseriya Bilind a Paneberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) ji bo jiholêkaririna Kampa Etrûşê zêde dibe. Her wiha jî gelê li kampê ji bo ku vê biryarê bi şûn ve vegeirîne, hin çalakiyan li dar dixê. Greva birçîbûnê ya ku di 18'ê berfanbarê de dest pê kiribû, roja 9'ê rêbendanê qediya, lê çalakiyên din didomin. Li gorî agahiyan bi qasî hezar penaberî ji bo ku xwe ji bombebaran ên balafirên tirkî biparêzin, çûne herêma rizgarî kirî ya di bin destê ARGK'ê de. Kesên ku li kampê mane (bi piranî jin, zarok û kal û pîr in) dan zanîn ku wê li hemberî biryara UNHCR'ê li ber xwe bidin. Li aliyê din kampanyaya piştigiriyê li bajarên Hewlêr, Silêmaniye, Ranya, Qeladizê didome. Kampanyaya îmzeyê ya ku bi serkêşiya hinek rewşenbîran, YNDK, NÇM, rojnameyên Welat û Welatê Rojê dest pê kiribû, hê didome. Hêta niha hejmarê kesên ku îmze dane ji deh hezari derbas bûye.

Li derveyî welêt jî, ji bo piştigiriya penaberan hinek çalakî tene lidarxistin. Bo nimûne heftiya çûyî komek rewşenbîr û parlementerên îtalî li ber deriyê UNHCR'ê xwestin ku ew xwestin ku ev biryara nelicîh ji şûn ve bê girtin. Her wiha hate gotin ku ewê heyetê pêk binin û ji bo çavdêriya rewşa penaberan biçin herêmê.

Dîsa Tora Agahiyan a Kurdên Amerîkayê (AKIN) di internetê de kampanyayêke nameyan daye destpêkirin. Li ser navê AKIN'ê nameyek ji Berpirsê UNCHR'ê Ms. Sadako Ogata re hate şandin. Di vê nameyê de rêveberên AKIN'ê bîzarîya xwe ya li hemberî biryara valakirina Kampa Etrûşê finin zimên û dixwazin ku ev biryar bi şûn ve bê girtin. Di nameya de tê bibîrxistin ku 15 hezar kurdên bakurî ji ber êrişên dewleta tirk reviyane. Name gotinên penaberekî 70 salî ku di 16'ê gulana 1994'an de ji heyeteke parlementerên kurd re gotine vediguhêze: "Gundê me bi rojan hate

bombebarankirin; xaniyê min ji ber vê yekê hate hilweşandin."

Dîsa name çêlî kampanyaya Rêxistina Efüyê ya Navneteweyî (AI) ku di kewçera sala çûyî de li hemberî Tirkîyeyê dabû destpêkirin, dike. Diyar dike ku li gorî raporên Komîteya Ewropayê ya ji bo Berbendkirina Îşkenceyê, li Tirkîyeyê bi sistematîk îşkence tê kirin. Berpirsên AKIN'ê didin zanîn ku dewleta tirk naxwaze kurdên bakurî bibin penaber, lewre ew rûyê wê êşkere dikin. Dîsa tê gotin ku bi vê biryarê daxwaza dewleta tirk tê cih.

Ji bo piştigiriya kampanyaya AKIN'ê Serokê Hevkariya Mafên Mirovan li Fairfax a Virginiyê û pîreka Senatorê amerîkî John Porter, Kathryn Cameron Porter nivîsek nivîsî. Em vê nivîsê jî îngilîzî werdigerînin kurdî û pêşkêşî we dikin:

"Hikûmeta Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê çend meh berê 7 hezar kurd rihî kirin. Ev jin, mêr û zarokên wan piştî çend seferên hewayî yê dramatik gihîştin Girava Guamê. Di vê demsalê de ew kes bişans bûn ku ji parêzkariya dewleteke mezin a gerdûnê sûd wergirtin.

Kesên bêşans, kurdên ji Tirkîyeyê yê li Kampa Etrûşê ne. Bi qasî 15 hezar kal û pîr, jin û zarok ji UNCHR'ya ku ew du sal in çavdêriya wan dikir, biryarnameya rawestandina alîkariyê girtin. Kî ew kurd? Çima ew Neteweyên Yekbûyî (NY) dev ji parêzkariya wan ber dide? Niha li çiyayê Kurdistanê şerekî giran didome. Agahiya amerîkiyan li ser rewşa kurdên bakurê Iraqê ango başûrê Kurdistanê ne hindik e.

Şerê din ku kêma amerîkî jê agahdar in, li çiyayên Kurdistanê Tirkîyeyê ye.

Ev kurdên em qalê dikin maxdûrên wî şerî ne. Ew di destpêka adara 1994'an de bi darê zorê ji gundên xwe hatine derkirin û li Kampa Etrûşa bakurê Iraqê bûne penahende. Rêxistina gerdûnî ku bi arîşeyên wiha re eleqedar dibe UNHCR'ê alîkarî da wan û ew kirin bin parêzkariya xwe.

Dawiya vê hefteyê ev alîkarî qediya. Daxuyaniyê UNHR'ê ku roja 22'yê rezberê dabû çapemeniyê û ji aliyê Ruterê ve hate belavkirin. Tê de tê gotin wê UNHCR "Çara dawîn xurek û pêdivî li şeniyê Kampa Etrûşê belav bike."

Di vê serdema giran de tişteki gelek çewt e ku yek dev ji alîkariya 15 hezar penaberên kurd ên ku bi tenê rêxistinên cihanî karin alîkariya wan bikin, berde. Zivistan kurdan a giran li derî dide. Di serî de zarok, gelek penaber wê ji serma û birçînan bimirin. Hê wext heye ku mirov rê li ber vê karesate mirovî bigire. Ji ber ev kurd ji ber dewleteke hevalbenda me reviyane, ew nayê wê wateyê ku ev demsal ji wan re bibe demsala êş û azarê.

Sê listikvanên vê listikê hene. Di girtina vê biryara çewt de serlistikvan Tirkîyeyê ye. Hikûmeta Enqereyê li ser hev her tim radana baregehê dixwaze. Hikûmeta di şerê xwe yê li hemberî kurdan de dil dike ku rê li ber qûd û cilên ku ji penaberan Baregeha Etrûşê re diçe bigire.

Artêşa tirk li çiyayên Kurdistanê li dijî rêxistina ku berê marksîst bû, lê niha doza mafên kurdan ên demokratîk dike, yanî PKK'ê ye. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan beşdarî bernameya Panel a MED-TV'yê bû û bersiva daxuyaniya UNHCR'ê da. Wî got: "Tu servanên

PKK'ê li baregehê tune ne. Heke hebin jî ez ferman didim ji bo ku ji wir veqetin. Herin baregehê kontrol bikin, heke we şervanekî PKK'ê li wir dît, parêzkariya xwe rakin li ser baregehê. Lê heke xwişk û birayên zarokan di nav rêfê gerîla de cih girtibin, heke dê û bavê wan piştevaniya tevgera me dikin, em nikarin ji wan bixwazin ku piştigiriya me nekin."

Neteweyên Yekbûyî dibêjin çalakdar nahêlin ku "penaber tercîha xwe di warê vegeirîn û venegerîna li Tirkîyeyê bi awayekî serbest bikin."

Niha li Tirkîyeyê şerê qirêjî bi gurehî didome. Îşkence, kuştin û windakirin zêde dibin. Biryarnama ya 136'an Kongreyê 104'an wiha dibêje: "... Windahiyan mirovî yê wî şerî gelekî zêde ye, 20 hezar kes hatiye kuştin, 2650 gund hatine sewitandin."

Di 16'ê gulana 1994'an de komek parlementerên kurd ji Tirkîyeyê çûn serdana Baregeha Etrûşê. Hevpeyvînan ku bi niştecihên ku reviyabûn Kurdistanê Iraqê re pêkanîn kişandin kamerayê. Kirinên ku bûbûn sedema penaberiya li dû hev dihatin vegotin.

Neteweyên Yekbûyî divê nebe hacetê tirkî di vê kêşaya kurdî de. Ev penaber divê yan bîna parastin li cihê ku ew lê dimînin, an jî rê li ber van vebe ku ew herim welatekî din. Salên çûyî ez bi xwe du caran çûm serdana vê baregehê rûyê kal û pîr, jin û zarokan tê ber çavên min. Di vê sersalê de ku em li malên xwe yê germ û ewledar Chrismasê pîroz dikin trajediya jiyana wan mirov bêzar dike. Şandina penaberan a Tirkîyeyê, wekî mirov şivantiya pez bispêre gur e."

SAMİ BERBANG